## Pêşmerge li dijî şerê navxweyî ne

Hefteya borî li hemberî dagirkirina axa Başûr û polîtîkayên PDK'ê, 180 pêşmergeyên ku hê li ser kar û peywira xwe bûn, biryara çekdanînê, girtin. Pêşmergeyan gotin ku dê li hemberî gerîla şer nekin. Pêşmergeyekî Dêrîn jî got ku ger pêwîst bike dê guleyê berî xwe bide lê berî gerîla nade... *R.6*



## Li dijî dagirkeriyê paşve gav navêje

Edhem Barzanî demek berê ragihand ku li dijî êrîş û dagirkeriya dewleta tirk a li ser başûrê Kurdistanê dê biçe derveyî welat û di demeke kurt de vegere. Barzanî bersiv da îdiayên ku dê venegere Kurdistanê û wiha got: "Kurdistan wargeha pîroz a min e û heta mirin jî min û welat ji hev dûr nagire."




# xwebûn

21-27 HEZÎRAN 2021 HEJMAR: 79 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Hemû kes kujeran nas dikin

Hikûmeta AKP-MHP'ê di her fersendê de HDP'ê hedef nîşan didin. Piştî hedef nîşandayînan kujerê bi navê Onur Gencer bi ser avahiya HDP'ê ya Îzmîrê de girt û endama HDP'ê Denîz Poyraz qetil kir. Li gelek navendan bi hezaran kesî êrîşa li Îzmîrê şermezar kirin. Di daxuyaniyan de hat gotin ku hemû kes kujeran nas dikin û ev êrîşeke plankirî ye... *R.3*

## Denîz keça gelê kurd e

Dayika Denîz Poyraz, Fehîme Poyraz destnîşan kir ku Denîzek çû dê bi hezaran Denîz werin. Dayik Poyraz anî ziman ku Denîz keça gelê kurd e û wiha got: "Em pê serbilind in." Poyraz da zanîn ku tevî astengiya polîsan jî cenazeyê keça xwe dîtiye û wiha got: "Ez çûm min çavreşa xwe dît. Gule bera serê wê û sînga wê dane. Min eniya keça xwe ya di nava xwînê de mabû maçî kir." Bavê Denîz Poyraz, Abdulîlah Poyraz jî wiha got: "Li dijî zilmê bi hezaran Deniz hene. Keça min ji wan keç û xortên kurd ku bi kîmyewî kuştine ne cuda ye. Keça min ji Sêvêyan, Pakîzeyan ne cuda ye. Lokman Bîrlîk bi pey panzêrê ve kaş kirin. Keça min ji wan ne cuda ye. Mehmet Tûnç şehîd xistin, Deniz ji wî ne cuda ye. Em çi jî bikin kêm e. Em hêj ji vî gelî re deyndar in. Em çiqas bedel bidin jî deynê me ji bo vî gelî naqede. Şehîda me hemûyan e."... *R.3*




*Denîz Poyraz li Cizîrê jidayik bû!*

*Cenazeyê Denîz Poyraz li Îzmîrê ji aliyê bi hezaran kesî hat oxirkirin. Di merasîma cenazeyê de hat gotin ku dê alaya Denîz Poyraz li erdê nehêlin. Li navçeya Cizîrê ya Şirnexê dayika bi navê Ayşe Cîn navê Denîz Poyraz li keça xwe kir û wiha got: "Îro Denîzek hat qetilkirin, lê em ê Denîzên nû mezin bikin û têkoşîna wê bidomînin."... R.3*

# Nameya banga xwedîderketina grevên birçîbûnê



Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê, di 27'ê mijdara 2020'î de, bi armanca bi dawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û zextên li girtîgehan bên bidawîkirin dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Greva birçîbûnê zêdetirî 200 roj in dewam dike. Hevseroka KCD'ê Leyla Guven ji Girtîgeha Jinan a Xarpêtê nameyek weşand û bang li raya giştî kir ku bi têkoşînê tecrîdê bişikînin û piştgiriyê bidin greva birçîbûnê... *R.4*

## Av bûye mijara polîtîkayê

Tirkiye li dijî gelên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê polîtîkayên xwe yên dijmirovahî didomîne. Wek tê zanîn ji 27'ê çile ve Tirkiyeyê ava Çemê Firatê li ser herêmê qut kiriye. Qutkirina avê li herêmê dibe sedema encamên xirab ên wek çandinî, tunebûna ceyran û destpêkirina nexweşiyan jî. Di van mehên dawî yên havînê de... *R.7*

## Areyî

Bi serran û zemanan verî merdimî şîyêne karwanî. Qeybî rayîr dûrîya, qeybî hendî leze biresê cayê xo gere serê sibayî rew bikewê rayîr, rew şorê. Ger înan ra yew erey bimendê cayo ke ê kom benê, henî şîne keye û vendayêne ci. Helbet zey enkay bolixî çinêbî, werdê merdiman bi sînor bî. Serê sibayî çay wetêrî şarî germî dayêne ser û werdêne. Serê sibayî rew go karwan wirzo we. Hawnenê dewijan ra yew nêameyo. Yewî şirawenê dima... *Cemîl Oguz / R.9*



## Şoreşa perwerdeyê

Îro dilê hemû kurdan bi Şoreşa Rojava re diavêje, dengê hemû kurdan li Rojava berz dibe. Mamosteyên Zanîngeha Kobanê dê jî me re behsa Zanîngeha Kobanê kirin... *Hevpeyvîna Bahadîn Akhan / R.4*

## Çand bingeha qanûnan e

Rabûn, rûniştin, danûstendin, kirrîn û firotin, şer û aştî, navbeynkarî, lihevkirin, jihevcuda bûn, her cure karûbar û her wiha reng û rûçikê bawermendî, cîhêrengiya ziman û zaninê wekî teşeyê jiyanê bi tevayî nîşana çanda gel, rêgeza çêkirina qanûn û destûrnameyan jî eşkere dike. Di dema îroyîn de dewletên şareza gava bixwazin qanûnan amade bikin giraniyê didine sazûmaniya çand û civakê. Li gor reng û rûçikê civakê qanûna saz dikin û destûrnameyan pêşkêş dikin. Lewma hergav nabza civatê tê girtin, lêkolînên der barê bûyerên diqewimin û nêzîkdayîna civakê tê pîvandin. Li ser vê bingehê hîmê qanûnan tê hunandin. Bi demajoyê re vegu-herîna çand, aborî, teknolojî û civatê riya veguherîna qanûn û rêznameyan jî bi xwe re tîne... *Ehmed Pelda / R.8*

## Azadî heqîqeta destpêkê ye

Zanabûn gava yekem a azadiyê ye. Ji mêtina şîr bigire heyanî sirên jiyanê fêrbûyîn e. Ked, westandin hest, azwerî û tevgerekê dixwaze. Bêguman weke destpêkê jî me diyar kiriye, hewldana zanebûnê gava yekemîn a azadiyê ye. Piştî ku mirov ji dayik dibe heta temenê axaftinê şûn de hemû peyvên ku dibihîze di aqil de ku mîna sindoqekê ye, dihêle. Her ku mezin dibe mîna civaka di nav de dijî dixwaze wateya peyvan li gorî fêrbûyîna destpêkê bi kar bîne. Bêguman weke destwerdanê wê demê azadî çi ye. Peyvên mê koka xwe ji temsîla beraketê, zêdebûnê dike, hatine bikaranîn. Mînakên herî balkêş... *Roja Welat / R.2*

## Penêrê hefnikî

Her cara mijara perwerdeya bi zimanê kurdî di rojevê de be, siyasetmedarên partî û rêxistinên komara tirk, radihêjin gopalên xwe yên bi sêhr û cambaziyan dikin. Yek ji wan Muharem Înce ye. Muherem Înce beg xwest bibe Serokomar. Bi ser neket û îsal partiya xwe Memleket Partîsî ava kiriye. Der barê pirsgirêka perwerdeya bi zimanê kurdî, Muharem Înce du tiştan ji me re dibêje; zimanê kurdî têra pedagojiyê nake... Dilşewatî meziyetek çê ye, dilşewatiya zêde jî derziya jehrê ye. Hin xwedî kole jî dilê wan bi koleyan dişewitî lê ne dijî bindestiyê bûn. Di serdema me de... *Seyidxan Anter / R.5*

## Qezenckirina zarokên tawanbar

Tawanbarî û krîmînalî pirsgirêkeke civakî ya navnetewî ye. Di her sîstemî de kesên tawankar, krîmînal hene. Tawanbarî di nav ciwanan de gelek zêde ye. Tu dewlet nikare ji sedî sed pêş li kesên tawanbar û bûyerên krîmînalî bigire. Ev bûyereke aloz û girîft e. Gelek sedemên wê yên civakî, çandî, aborî, malbatî û derûnî hene. Lê her sîstem an jî dewlet ji xwe re li rê û rêbazên kêmkirin û çareserkirina kes û karên tawanî û krîmînalî digere. Li gorî bawerî, çand, polîtîka û îdeolojiya xwe, qanûn û rêbazan dirust dikin û pêk tînin. Dewletên teokratîk, paşvemayî... *Amed Tigrîs / R.8*


# Azadî heqîqeta destpêkê ye

Roja Welat

**Jinên ku zayînê pêk anîn û zad keşf kirin heqîqeta jiyanê fam kirin. Ew heqîqet famkirin mirovên bi wate û zanebûnê çawan jin û jiyan dibe yekwate, wê demê mirov dikare bêje ku rastî ye**

Zanebûn gava yekem a azadiyê ye. Ji mêtina şîr bigire heyanî sirên jiyanê fêrbûyîn e. Ked westandin hest, azwerî û tevgerekê dixwaze. Bêguman weke destpêkê jî me diyar kiriye, hewldana zanebûnê gava yekemîn a azadiyê ye. Piştî ku mirov ji dayik dibe heta temenê axaftinê şûn de hemû peyvên ku dibihîze di aqilê ku mîna sindoqê de dihêle. Her ku mezin dibe mîna civaka di nav de dijî dixwaze wateya peyvan li gorî fêrbûyîna destpêkê bi kar bîne. Bêguman weke destwerdanê wê demê azadî çi ye? Di çi wateyê de tê bikaranîn, an jî naveroka wê peyvê ji aliyê pergala baviksalar ve çiqasî hatiye pûçkirin? Gotina kêlî di dîrokê de, mirov di civakê de veşartiye em bêjin bawer im pir vala nabe. Ji wê gotinê em derdikevin rê û dîsa vedigerin şoreşa neolîtîkê axaftin, berhem, jiyan, çand, huner bi kinahî hemû sirên jiyanê di destpêka me de veşartiye. Weke destpêkê jî me nirxandiye, jidayikbûnê û şûn de axaftin tên fêrbûn, lê mixabin kokê wê çawaniya wê yan jî dîroka wê pir zêde ji aliyê civakê ve nayê mereqkirin, yan jî lêhûrbûnek li ser pêş nakeve. Şoreşa neolîtîk ku bi pêşengiya jinan hat jiyîn bandora xwe li ser axaftinê jî kiriye.

Peyvên mê koka xwe ji temsîla berketê, zêdebûnê dike, hatine bikaranîn. Mînakên herî balkêş yek ji wan jî peyva azadiyê mirov dikare bi du awayan bigire dest. Aza-dî, ya zayî yan jî a zad dîtîbi her du awayan jî bi taybetmendiya dewlemendiyê berhemê jinan derdikeve pêşiya me. Di şoreşa neolîtîkê de berhem ji bo wan, qutsiyet bûn, weke din pîroz bûn. Zad ji ber ku wan dide jiyandin pîroz bû, jin jî ji ber hem ji taybetmendiya zayînê hem jî ji ber dîtina zad pîroz bû. Bi avabûyîna dewleta Sumeran re êrîş li ser nirxên civakê tê kirin. Di hemû deman de li ser çîrok, destan, axaftin, çand ku di nava vê de ziman a sereke ye, di bin êrîşek dijwar de dimînin û bi wan re bi aqilê civakê tê lîstin. Guherandina wate, berhem û axaftinan jî pêk tê. Bi taybet bi hatina pergala kapîtalîst re sereke nifşên ciwan di nav de ji bo civakê azadî takekesî û bi serê xwe jiyîn dibe. Ji civaka niha azadiya xwe jiyandin bi mîsogerî dikarim bêjim wê bersiva wî/wê heya ku hesab bidin tu kesî jiyan bikim be. Lê em ji ber nikarin ku azadiya rast çawa ku me mînaka bereket û zad da, li gorî wê xwe ji zanekirinê dest pê dike. Jinên ku zayîn pêk anîn û zad keşf kirin heqîqeta jiyanê fam kirin. Ew famkirina heqîqetê, mirovên bi wate û zanebûnê çawa jin û jiyan dike yekwate, wê demê mirov dikare bêje ku rastî ye. Naskirina jinan, naskirina heqîqeta jiyanê û xwezayî ye. Li xwebûna xwe vegerandin; wê demê tu jinan nas bike û ber bi azadiyê ve bimeşe.





# Her wêneyek çîrokeke bê ziman e

Di cîhana her mirovê/î de bi dehan xeyal hene, bi taybetî jî ew kesên ku ji zikmakî ve astengdar tên cîhanê. Dibe ku ew kesên bê dest, ling, çav û di laşê xwe de kêm bin, ne bê hest, xeyal û armanc in. Însan di laş de astengdar be lê di fikir, hiş û baweriya xwe de saxlem be, ji mirovên xwedî aqil bêtir dihizirin û ji bo rengdayîna cîhana xwe, dikarin her tiştî bikin. Yek van kesan ku nebûna du milên xwe jî ji xwe re nekiriye asteng û xeyala xwe pêk aniye, Dûa El-Bestatî ye.

Dûa di destpêka axaftina xwe de ev yek anî ziman: "Ji zikmakî ve ez bêdest hatime dinê lê ez qebûl nakim ji min re bêjin; keça astengdar. Ez tu carî bê hêvî nebûme û nejiyame, her dem bi hêvî bûm ku ez ê nêrîna civakê ji kesayeta xwe re biguherînim û hunera xwe nîşanî wan bidim."

Dûa bi evîneke mezin, bi firçe û rengên xwe yên ku cîhanê ji tarîtiyê derdixe re dibe yek.

**Xêzkirin, vegotina hest û xeyalan e**

Dûa destnîşan kir ku xêzkirin vegotina xeyal û hestên mirovan e û wiha domand: "Min xêzkirin hilbijart ji ber ku bi saya wê, min dikaribû her tiştê di hundirê xwe de vebêjim. Xêzkirina her nîgarê xwedî çîrokek e. Ez her cure xêzkirinê çêdikim, mînak xêzkirina li ser daran û li ser camê jî xêz dikim."

**Têkiliya jin û hunerê**

Di berdeawma axaftina xwe de Dûa got ku têkiliyeke hevgirtî di navbera jin û hunerê de heye û ev tişt anî ziman: "Jin û huner hev temam dikin. Bi rêya hunerê hest, daxwaz û xeyalên mirovan dertên holê. Dibe ku gelek jin nikaribin qala tiştên di hundirê xwe de bikin. Lê bi rêya xêzkirina nîgaran û helbestan, dikare wê bêyî ku biaxive nîşan bide."

Dûa da xuyakirin ku her wêneyek çîrokeke wê heye û wiha domand: "Di her wêneyekî de peyamek heye û çîrokeke wê heye. Bi rêya her wêneyeke jinan ez dixwazim peyamekê bidim ku jin dikarin, ruxmî hemû zorî û zehmetiyan rêyeke ji xwe re ava bikin û tê de bimeşin."

**Mirovên bêdest ne astengdar in**

Her wiha Dûa axaftina xwe bi van hevokan bi dawî kir: "Mirovên bêdest û ling ne astengdar in, xewn û xeyalên wan hene û mîna deryayan in. Divê ku malbat guh bidin zarokên xwe û bihêlin li ser lingên xwe bisekinin û astengdariya wan, nebe kelem li hemberî pêkanîna xewn û xeyalên wan. Divê hunera wan a veşartî, derkeve holê û cîhanê bibîne û bixemilîne. Mafê wê/î heye ku cîhanê bi rengê ku ew dixwaze bibîne."

***Çavkanî: Nû Jinha / Sorgul Şêxo***

# Di birdoziya PDK'ê de cihê jinan tune ye



Adar Şaman

Di pêşengiya dayikan de pêdiviya tevgereke rêxistinkirî ya li dijî şerê kurd bi kurd re ku bikeve nava liv û hewildanan, heye. Dayikên Laçîkspî yên pakrewanan, Dayikên Şemiyê û Dayikên Aştiyê di vê der barê de xwedî ezmûnek girîng in. Êdî dema wê ye ku ev ezmûn têkeve nav tevgerê. Dem ew dem e ku dayik li dijî şer, li Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava dakevin qadan, pêşengiya dijberiya şerê nav kurdan ku hema maye wê biqewime, dijberiya xwe aşkera nîşan bidin. Ew hêza dayikan a li dijî şerê navxweyî heye ku bi erka navbeynkariyê rabin. Em ji dîroka xwe ya Kurdistanê dizanin, dema dayikan laçika xwe ya spî datînin meydana şer, çek tavilê radiwestiyan, gotina dawiyê dayikan digot. Êdî dema avêtina laçikên spî ya qada şer e ku li herêmên PDK'ê dorpêç kirine, ji bo ku şer biqewime hincetan digere.

Di van kêliyên dîrokî de ku derfetên serkeftinên mezin hatine afirandin, gelê kurd ji her demê bêhtir xwe nêzî azadiyê hîs dike. Ji bo ku kurd ji van derfetan statu bi dest nexin, hewldanên hêzên statukoperest ên paşverû, ew e ku şerekî di navbera kurdan de derxin. Lewra berjewendiyên van hêzan di parçebûyîna kurd û Kurdistanê de ye.

**Hişmendiya zilamê serdest**

Şerê dinyayê yê herî domdirêj û bê dawî ku ji hezarê salan ve dijî jinan tê meşandin; lê nav lê nehatiye kirin ku kîjan cureyên şer li dijî heyîna jinan hatine bikaranîn. Ji ber ku şerekî bi her awayî tê meşandin heye. Ev şer, pir alî tê kirin. Cur bi cur e. Hemû şeweyên şer di nav hev de tên kirin; yê fîzîkî, çandî, derûnî-giyanî, hişmendî û bîrdozî bi hevre tên meşandin. Ev şer, bi qerektera hişmendiya hiyerarşiyê ku desthilatdarî ser vî fikrî sazûman bûye, xwe li ser heyîna civakê bi beden kiriye. Şerê hişmendiya zilamê serdest ku 5 hezar sal in dijî "neteweya" jin tê meşandin, kêlî bi kêlî di asta qirkirina jinan de, êdî tevahî zindî, ajal û xweza daye ber xwe û berbelav bûye. Jin; ji dîroke heya îro, bi dijberiya xwe ya şer tên nasîn. Jixwe heyîna jinan, ji çavkaniya xwenasiyê tê.

**Nêzîkatiya PDK'ê ya li hemberî jinan**

Mînaka vê ya herî şenber mirov dikare ji bo hişmendiya PDK'ê ku bi hemû awayî dijberiya aqlê jinên azad a di xwebûnê de bi israr, têkoşer û berxwedêr in, ditirse. Asta hişmendiya PDK'ê ya dijbertiya jinan, ji polîtîkayên netewe-dewletê gelekî paşketîtir in. PDK'ê, ne di çarçoveya hiqûqa çîna burjuvaziya biçûk de, ne jî li gor kevneşopiya civaka kurd, nezî jinan dibe. Di felsefeya vê hişmendiyê de, forma jinên azad tune ye. Rastiya jinan bi awayekî parçeparçe digire dest û tevdebûna heqîqetê di rastiya jinan de berevajî dike. Bîrdoziya ku PDK li ser avabûye, ji rêya azadiya jinan re, derbas nabe.

**Di damezrandina wê de jin tune ne**

Di vekolîn û lêkolînên der barê dîroka PDK'ê de, yên heya niha hatine kirin em rastî jinekî ku di damezrandina rêxistina PDK'ê de cih girtiye nehatin. Di damezrandina PDK'ê de, cih ji jinan re nehatiye dayîn ku beşdarî nava vê rêxistinê bibin. Polîtîkayeke ji bo jinan tune ye. Siyaseta PDK'ê, siyaseteke tekane ye. Ji hêla zihniyet û hişmendiyê ve bi nêrîna zilamê paşverû-serwer tevdigere. PDK ne rêxistineke jinan e; her wiha jin jî xwe aîdê vê pergalê nabînin. PDK ne rêxistinek e ku jinên kurd, azadiya xwe di binemaliya wê de bi pêş de bibin. Lewma pergala wê rê nade bîrdoziya rizgariya jinan. Rêxistineke ku fikir, nêrîn û aqlê jinan bandora xwe lê ne kiribe, paşeroja wê tevgerê tarî ye ango mehkûmî binketinê ye.

**Ji bav, kur û pismaman pêk tên**

Tu polîtîkayên PDK'ê, yên der barê azadiya jin û civakê de tune ye. Li Başûrê welêt jin tên kuştin, "xwe dişewitînin," rastî tundtûjiyê tên, bi destavêtinê re rû bi rû dimînin an jî xizanî dibe sedem ku debara zarokên xwe neke, lê ev di rojeva PDK'ê de nîne. PDK deshilatdariyek e ji komek zilaman hatiye avakirin. Ev koma zilamên serdest ku ji bav, kur û pismaman pêk tê, siyaseteke yekreng, yekdeng dimeşînin; vîna jinan tune dihesibînin. Ev koma zilamê serdest, astengiya herî mezin a li pêş rêxistinbûyîn, azadiya jin û civaka Başûrê welêt e. Desthilatdariya xwe li ser nirxên civaka jinan ava kiriye; li dijî fikra çep – sosyalîst û muxelîf a kurd bûye desthilat. Pêşketina jinan li Başûrê welêt, tê wateya lewazbûna desthilatdariya zilma PDK'ê.

**Tenê fikra zilamtiyê temsîl dike**

Encama vê zihniyetê ye; PDK'ê rêya yekitiyê ya nava kurdan xitimandiye. Bi her awayî bo yekitî pêk neyê alozî derdixe. Dijberiya PDK'ê ya li hember jinan, xwe dispêrê dîroka damezrandina wê. Rêxistinek fikra zilam temsîl dike. Temsîla jinan nake. Jinên, şoreşger, berxweder xwe aîdê rêxistina PDK'ê nabînin; azadiya zayendî di hebûna vê partiyê de nayê dîtin. Jin, xwe ji nû ve alternatîfê pergala vê zihniyetê pênase dikin. Li Başûrê welêt, di pêşengiya jinên ciwan de hêza alternatîf a pergala neteweya demokratîk xwe bi rêxistin dike.

**Îdia dike ku xwediyê Kurdistanê ye!**

PDK, îdîa dike ku ew xwediyê Kurdistanê ye. Ew ruhê ku Kurdistanê parçeparçe difiroşê, ew ne giyaneke kurdewar e. Vê jî aşkera dike. Ew wer dizane ku dê kurd her bêdeng bimînin. Lê êdî kurd ne kurdên berê ne, ruhê neteweya kurd bi pêş ketiye. Hestê yekitiya neteweyî li ser hemû berjewendiyên eşîrtî û malbatî re ne. Helwesta gelê kurd a yekitiyê, planên PDK'ê yên şer vala derxistin û ew bi tenê ma. Hewldanên PDK'ê yên şer hene, ne ku yên diyalog û çareseriyê. PDK ji avakirin û çareseriyê direve, her ku ji şewaza çareserî, diyalogê dûr dikeve parçeyek ji xaka welêt pêşkêşî dagirkeran dike. Hebûna wê bi hêza desthilatdarî, hevkarî û gendeliyê ye. Hêza xwe ji nokeriye werdigire. Ev heyanî xeta dijbertiya nirxên neteweyî jî diçe. PDK di hevkariya li gel dagirkeran de, texsîr nake. Vê, bi şehnaziya desthilatdariya serweriya zilam dike. Bi hêza desthilatdariyê xwe li ser kurdan ferz dike. Lewma êdî ev ne pêkan e.



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Kê çek da destê wî?

Roja 17’ê hezîranê serê sibehê kesê bi navê Onur Gencer tevî çeka di destê xwe de bi çend kesan êrîşî avahiya HDP'a Îzmîrê kir.

Di vê êrîşa hovane de endam û xebatkara HDP'ê Denîz Poyraz hat qetilkirin û avahî jî hat şewitandin. Şêwazê êrişkariya tetîkkêş Onur Gencer dide diyarkirin ku ev êrîş ji berê ve hatiye plankirin. Jixwe dema mirov li daxuyaniya HDP’ê dinêre armanca vê êrîşê çi ye hîn baştir tê famkirin.

Rêveberiya HDP’ê da zanîn ku li avahiya HDP'ê civîna rêveberiya HDP'ê hebû. Lê ji ber plansaziyeke din, saeta civînê hatibû guhertin. Bi vî awayî tetîkkêş û aliyên wî li ser mijarê sor kirine negihaştin armanca xwe. Lê di encamê de li ser partiya siyasî ku li gor pîvanên hiqûqê û di çarçoveya zagonan de hatiye avakirin êrîşek hovane heye. Ji êrîşê wêdetir kuştinek heye.

Denîz Poyraz bi salan di nava xebatên ciwan û jinan de cih girtibû. Malbata Poyraz ji ber zextên dewletê ji Mêrdînê hatine û li Îzmîrê bi cih bûne. 3 birayên Denîz jî ji ber xebatên siyasî di zindanên dewleta tirk de dîl hatine girtin.

Ev êrîş çawa pêk hat?

Polîsên ku her roj û gav li dora avahiyê HDP'ê ne û her kesê ku dikevin hindur ji aliyê wan tên tespîtkirin çawa çêbû ku ev kesê êrîşkar nedîtin. Ev jî hevkariya polîs û êrîşkar radixe ber çavan. Di gelek êrîşên bi vî rengî de piştre derket ku polîsan beriya êrîşê bi tetîkkeş re wêne kişandine. Sibê dusibê wêneyên polîsan û hin aliyên siyasî bi vî kesî re derkevin jî divê em şaşwaz nebin. Me ev mînak di kuştina Hirant Dink de dît. Piştî wê wêneyên Ogun Samastê tetîkkeş bi polîsan re çawa derket holê wê wêneyên vî kesên tetîkkêş jî derkevin holê.

Der barê êrîşê de waliyê Îzmîrê di daxuyaniya xwe de hewl da ku kesê êrîşkar weke kesekî bêhna wî teng bûye nîşan bide.

Tiştê balkêş, televîzyona A Haberê ku di weşanên xwe de her tim HDP'ê hedef nîşan dide bi 3 kamerayên xwe û weşana xwe ya zindî li ber avahiya HDP'ê bû. Piştî bihîstina êrîşê bi hezaran kesî berê xwe da ber avahiya HDP'a Îzmîrê. Polîsên hatin cihê bûyerê dora avahiyê girtin. Nehiştin kes nêzî avahiyê bibe. Piştre jî êrîşkar ji avahiyê weke ku birevînin, birin.

Ertugrul Kurkçu der barê êrîşê de agahiyeke balkêş parve kir. Kurkçu destnîşan kir ku Onur Gencer tevî du tetîkkêşên din hatine avahiyê lê her duyên din reviyane.

Bêguman ev êrîş rewşa siyasî ya Tirkiyeyê aşkera dike. Jixwe serçeteyê tirk Sedat Peker di dîmenên xwe yên li ser tora dijîtal belav dike de balê dikşîne ser çeteyên ku di nav dewletê de bi cih bûne. Êdî desthilatdariya AKP-MHP’ê ji aliyê çeteyên di nav dewletê de bi cih bûne ku ev jî ji şer, pevçûn û kaosê sûdê digirin tê rêvebirin. Erdogan û Bahçelî jî li bo li ser postê desthilatdarê bimînin çavê xwe ji wan re digirin û şirîkatiyê bi wan re dikin.

Dixwazin bi cînayetên siyasî emrê xwe dirêj bikin. Ji xwe Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan jî gotibû: “Ger hevdîtinên li ser vê masê bi dawî bibin wê dest bi cinayetên siyasî bikin.”

Li Tirkiyê bi zanebûn dijminatiya kurdan pêş dixin. Divê ev êrîş û kesên ku ev êrîş plan kirine bi awayekî zelal werin aşkerakirin. Di vê ji tetîkkêş zêdetir yên çek daye destê wî bên zelalkirin. Di vir de ji şexs zêdetir têgeh û pêşxistina dijberiya kurdan mijara esasî ye.

# Qetlîameke plankirî bû

**Hikûmeta AKP’ê û çapemeniya alîgir di her fersendê de HDP’ê û siyasetmedarên kurd hedef nîşan didin. Piştî hedef nîşandayînan kujerê bi navê Onur Gencer bi ser avahiya HDP’ê ya Îzmîrê de girt û endama HDP’ê Denîz Poyraz qetil kir**

Navenda Nûçeyan




Hikûmeta AKP-MHP’ê û çapemeniya alîgirê hikûmetê bi salan e siyasetmedarên kurd hedef nîşan didin. Nemaze jî serokomarê tirk Tayyîp Erdogan di her axaftinên xwe de HDP’ê hedef nîşan dide. Heta niha bi dehan avahiyên HDP’ê rastî êrîşên çekdarî hatin û kesên ku êrîş pêk anîn nehatin cezakirin.

Piştî evqas hedef nîşandan û êrîşên li dijî avahiyên HDP’ê vê carê jî di 17’ê hezîranê de avahiya HDP’ê ya Îzmîrê rastî êrîşa çekdarî hat. Kesê bi navê Onur Gencer saetên serê sibehê bi çeka xwe ket avahiyê û kedkar û endama HDP'ê Denîz Poyraz (38) qetil kir û hewl da avahiyê bişewitîne. Tê gotin ku 3 kes ji bo êrîşê hatine avahiya HDP’ê, 2 kes reviyane û tenê kujer Gencer hatiye girtin.

Hat gotin ku Denîz Poyraz bi 6 guleyan hatiye kuştin. Dîmenên avahiya ku rastî êrîşê hatiye hatin weşandin û di dîmenan de derket holê ku kujer Gencer gule berî avahiyê daye û li ser maseyê di tebaxekê de taştêya Poyraz heye û taştê ya wê jî frîngî û zeytûn bûye.

**Kekê navê te çi ye!**

Derket holê ku kujer Onur Gencer piştî êrîşê Denîz Poyraz a di nava xwînê de mabû kişand û di WhatsAppê de parve kir. Hat dîtin ku Gencer wêneyê Denîz bi gotina “termê yekem” parve kir. Gencer dema ji aliyê polîsan hat girtin got ku ji ber ku ji PKK’ê hez nake êrîş pêk aniye. Gotina Gencer pir dişibe axaftinên Erdogan û berdevkên hikûmeta AKP’ê. Ew jî di her fersendê de dibêjin HDP û PKK heman tişt in. Balkêş e ku dema polîs Gencer binçav dikin wî kelemçe nakin û bi awayekî dostane jê dipirsin; ‘kekê navê te çi ye’?

Gencer di îfadeya xwe ya li midûriyeta polîsan de aniye ziman ku bi mehan e plansaziya êrîşê kiriye û çend caran jî keşif kiriye. Êrîşkar ku di meha Gulanê de ruxseta çekê wergirtiye di îfadeya xwe de gotiye: "Hin kesên din hebûna, min ê bera wan jî bida."

**Provaya cînayetên siyasî**

Piştî êrîşê bi hezaran kes hatin ber avahiya HDP’ê û bi dirûşman êrîş şermezar kirin. Endamê MYK’a HDP’ê Mahfûz Guleryuz, diyar kir ku rexmî li pêşiya avahiya HDP’ê ya Îzmîrê qereqola polîsan heye jî êrîş pêk hatiye û ev tişt got: “Êrîşkar hatibû qetilkirina endamên MYK’ê û hevserokên bajar. Ev dewlet dizane. Provaya cînayetên siyasî hat kirin.”

**Êrîşeke plankirî bû**

Piştî qetlîamê hevserokê HDP’ê Mîthat Sancar daxuyanî da û ragihand ku ev êrîşeke ji rêzê nîn e, êrîşeke plankirî ye û di wan saetan de civîn hebûye lê civîn hatiye taloqkirin û ger nehata taloqkirin dê qetlîameke mezintir pêk bihata.

Hevseroka HDP’ê Pervîn Buldan gotinên serokkomarê tirk Tayyîp Erdogan a “Ev rojên we yên baş in” bi bîr xistin û pirsî “Ma we dizanibû dê ev komkujî pêk were?” Hevserokên HDP’ê hatin avahiya partiya xwe ya Îzmîrê bi endam û rêveberên partiya xwe wêneyê Poyraz û gul danîn cihê Poyraz lê hat qetilkirin.

Piştî êrîşê ji partiyê muxalefetê jî daxuyanî hatin belavkirin û CHP, Partiya Gelecekê û Partiya Devayê serdana HDP’ê kirin û êrîş şermezar kirin.

Rêxistin û siyasetmedarên navneteweyî, êrîş şermezar kirin û bang li Parlamentoya Ewropayê kirin ku bikeve nava tevgerê.

**Qeydên kamerayê jêbirin**

Hat hîn bûn ku polîsan dest danîne ser qeydên kamerayên têketina avahiya HDP’ê û dû re qeyd jê birine. Esnafên derdorê diyar kirin ku polîs di saetên serê sibehê de hatin cihê kar, qeydên kamereyan ên hefteyekê girtin û piştre qeyd jê birine. Esnafan bi lêv kirin ku polîsan tu hêcetên qanûnî pêşkeşî wan nekirine û qeydên di cihazan de jê birine.

## Li gelek deveran hat şermezarkirin

Qetilkirina Denîz Poyraz di serî de li Amed, Wan, Riha, Agirî, Dêrsim, Xarpêt, Mêrdîn, Êlih, Semsûr, Dîlok, Edene, Stenbol, Osmaniye, Hatay û gelek deverên din bi meş û çalakiyan hat şermezarkirin. Di daxuyaniya Stenbolê de polîsan êrîşî çalakvanan kirin û gelek kes hatin binçavkirin. Li Amedê jî parlamenterên HDP’ê û gel li semta Ofîsê kom bûn û xwestin daxuyanî bidin. Polîsan hemû kolanên Kuçeya Hunerê bi barîkatan girtin û nehiştin kesek bikeve kolanê. Li dijî astengiyan girse bi dirûşman ber bi kolana Gevranê meşiya. Li kolanê dîsa girse hat dorpêçkirin û polîsan êrîşî girseyê kirin. Parlamenterên HDP’ê bertek nîşanî polîsan dan.

Her wiha li ser medyaya civakî gelek hunermendên muxalîf û demokrat bertek nîşanî êrîşê dan û şermezar kirin. Meclisa Ciwanan a HDP’ê, wêneyê Denîz Poyraz bi Keleha Wanê ve kirin.

## Bêexlaqiya çapemeniya alîgir

Êrîşa li dijî avahiya HDP’ê ya Îzmîrê di rojeva çapemeniyê de berfirehî cih girt. Di serî de çapemeniya kurd û çapemeniya cîhanê cih dan qetlîamê. Çapemeniya alîgir a hikûmeta AKP’ê wekî her car dîsa hewl da bûyerê berovajî bike. Çapemeniya AKP’ê exlaq û rêgezên çapemeniyê binpê kir serî li derewan da. Rojnameya Yenî Şafakê destpêkê ragihand ku li avahiya HDP’ê ya Îzmîrê pevçûn derketiye. Her wiha piştre bi hevpeyvîneke derewîn xwestin bidin nîşandan ku qetilkirin ji aliyê HDP’ê ve hatiye organîzekirin.

## Denîz Poyraz keça gelê kurd e



Dayik û bavê Deniz Poyraz, Fehîme û Abdulîllah Poyraz ji Ajansa Mezopotamyayê re axivîn. Fehîme Poyraz diyar kir ku ew dayika 9 zarokan e û bi salan berê dema hatiye binçavkirin polîsan jê re pirsa “Te ewqas zarok ji bo çi welidand?” jê kirine û wiha got: “Dewletê 25 sal berê vê yekê ji min dipirsî. Pişt re sê zarokên min xistin girtîgehê. Deniza me jî ji me sitendin.”

Poyraz destnîşan kir ku Denîz keça gelê kurd e û wiha got: “Em pê serbilind in.” Poyraz da zanîn ku tevî astengiya polîsan jî cenazeyê keça xwe dîtiye û wiha got: “Ez çûm min çavreşa xwe dît. Gule bera serê wê û sînga wê dane. Min eniya keça xwe ya di nava xwînê de mabû maçî kir.”

Poyraz destnîşan kir ku gelê kurd xwedî li Denîz derdikeve û wiha got: “Li ber Saziya Tiba Edlî bi sedan polîs sekinandibûn. Xelk xwedî derket lewma tiştek nekirin. Ez dayika girtiyan û şehîdan im. Denîz êdî tenê ne keça min e. Xebatkara partiya xwe bû. Keça min tevlî karwanê şehîdan bû. Şikir xwedê re serê min bilind e.”

**Bi hezaran keçên kurd hene**

Bavê Denîz Poyraz, Abdullîllah Poyraz jî wiha got: “Li dijî zilmê bi hezaran Deniz hene. Keça min ji wan keç û xortên kurd ku bi kîmyewî kuştine ne cuda ye. Keça min ji Sêvêyan, Pakîzeyan ne cuda ye. Lokman Bîrlîk bi pey panzêrê ve kaş kirin. Keça min ji wan ne cuda ye. Mehmet Tûnç şehîd xistin, Deniz ji wî ne cuda ye. Em çi jî bikin kêm e. Em hêj ji vî gelî re deyndar in. Em çiqas bedel bidin jî deynê me ji bo vî gelî naqede.”

Poyraz gotinên xwe wiha bi dawî kir: “Şehîda me hemûyan e. Daxwaziya min ji xelkê me ew e ku em bibin yek û yekitiya me çê bibe. Bila serê gelê kurd û HDP’ê sax be. Ji destê Tayyîp û koma wî were wê êrîşî tevahiya Kurdistanê, Sûriyê û Iraqê bike. Wê ji ber têkoşîna gelê kurd bi ser nekevin.”

Jinan cenazeyê Poyraz bi tilîlî û çepikan birin mala wê û piştî merasîmê cenaze li Îzmîrê li goristana Kaynaklar a Bucayê hat definkirin.

## LI ROJAVAYÊ KURDISTANÊ ŞOREŞA PERWERDEYÊ

# ‘Em ê berxwedana Kobanê temsîl bikin’

Bahadîn Akhan

*Îro dilê hemû kurdan bi Şoreşa Rojava re li rojavayê Kurdistanê diavêje, dengê hemû kurdan li Rojava berz dibe. Pêvajoya şoreşê pêvajoya afrîneriyê ye, ji kavilan, ji wêranxaneyan û ji bermayiyên tofanê meriv jiyan û cîhaneke nû hildiberîne. Li Rojava jiyanek pêş dikeve, cîhanek tê berzkirin. Me jî xwest em di çarçoveya Şoreşa Rojava de dêhn û bala xwe bidin ser perwerdeya li Rojava pêş dikeve. Ji bo vê yekê jî em ê pêşiyê guh bidin pêşeng, dahêner û mamosteyên pergala perwerdeyê ya Rojava. Mamosteyên Zanîngeha Kobanê dê jî me re behsa Zanîngeha Kobanê bikin. Mamoste **Şervan Muslim** ku Endamê Desteya Rêveber a Zanîngeha Kobanê ye û maoste **Egîd Nasro** ku Hevserokê Fakulteya Wêje û Zimanê Kurdî ye dê bi me re bin. Ji bo alîkarî û piştgiriya mamosta **Xunav Îsa** ya di vê hevpeyvînê de jî em spasiyên xwe li wê dikin.*

**Di destpêkê de ez dixwazim bipirsim ka bandorên Şoreşa Rojava li ser perwerdeyê çawa çêbû? Ferq û cudahiyên çawa di navbera pergala perwerdeyê ya berî şoreşê û ya piştî şoreşê de hene?**

**Şervan Muslim:** Di eslê xwe de pergala perwerdehiyê ya berî Şoreşa Rojava ya li Sûriyeyê li ser me dihat ferzkirin, xwe dispart hin xalên bingehîn yên şovenîzmê. Meseleya nijadperestiyê tê de li pêş bû, meseleya tekzimanî, tekçandî tê de li pêş bû. Em di bin sîwaneke bi vî rengî de dijiyan û li gorî van xalan em dihatin perwerdekirin.

Li rojavayê Kurdistanê li ser kurdan û li ser pêkhateyên din yên wekî suryan, aşûr, çerkez, ermen hwd. dihat ferzkirin ku ew perwerdeyê, zanistê bi zimanê erebî fêr bibin û werbigirin. Her wiha çanda ku pêwîst bû bihata zanîn çanda ereban bû. Ji ber ku nasnameya me qedexe bû me nikaribû pê deng bikira.

Kurdên me yên li rojavayê Kurdistanê pir jîr bûn û ji nav kurdan gelek kesên navdar derketine, lê belê ji ber ku zimanê em pê dihatin perwerdekirin ne zimanê me bû, di nav me de xweragirtinek tim hebû. Ev hemû ji bo me bûn tecrûbe. Ji ber vê yekê jî me zimanê xwe li ser tu pêkhateyeke din ferz nekir, me li gorî paradîgmaya neteweya demokratîk pergala xwe ya perwerdeyê da rûniştandin. Piştî şoreşê hemû pêkhate li vir bi zimanê xwe perwerdeyê dibînin, di pergala perwerdeyê de nijadperestî bi tu awayî tune ye, dîrok li gorî heqîqeta wê tê şirovekirin, zanist ji bo xizmetguzariya civakî tê şirovekirin.

**Niha pergala Rêveberiya Xweser ya li Rojava, li dinê di kîjan astî de hatiye naskirin? Û girêdayî vê yekê jî gelo perwerdeya zanîngehên li Rojava, li hemû deverên Sûriye û cîhanê derbasdar e an na?**

**Ş. M:** Bê guman em xwe wekî parçeyeke Sûriyeyê dibînin û zanîngehên me jî zanîngehên Sûriyeyê ne. Bawernameyên ku ji aliyê Rêveberiya Xweser de jî derdikevin li cem zanîngehên me tên qebûlkirin. Her wiha bawernameyên berê yên ku ji aliyê pergala berê ve hatine dayîn jî li cem me tên qebûlkirin. Şagirt dikarin bi wan bawernameyan derbasî zanîngehan bibin. Lê pergal piçekî cuda ye. Di aliyê wergirtina mamosteyan de, di aliyê mufredatê de, di aliyê sîstema serkeftin û binkeftina şagirtan de me modeleke nû ava kiriye. Me ji hemû zanîngehên cîhanê yên pêşketî sentezek ji bo xwe çêkiriye.

Li ser van xalan niha qebûlkirin û erêkirina pergala Rêveberiya Xweser babet û biryareke siyasî ye. Di nav vê yekê de qebûlkirin û rewakirina pergala perwerdeyê û bawernameyên şagirtên me bi xwe jî bi vê biryara siyasî re girêdayiye. Bawernameyên zanîngehên me niha li herêmên Rêveberiya Xweser derbasdar in. Bê guman gelek têkilî û pêwendiyên me bi zanîngehên derve re jî hene ji bo ku bawernameyên me di asta navneteweyî de jî bên qebûlkirin.

**Gelo wekî mamoste di amadekirina mufredatên zanîngehan de hûn rêyeke çawa didine ber xwe? Cudahiyên mufredata we ji ya zanîngehên din çi ne?**

**Egîd Nasro:** Em di destpêkê de asta xwendekaran li ber çavan digirin. Dû re li gorî pêwîstiyan em tev digerin. Her wiha di zaningehê de beşê wêjeyî û beşê zanistî heye. Niha ya me tenê di milê beşê wêjeyê de li pêş e. Lewra li Zanîngeha Kobanê tenê Wêjeya Kurdî wekî fakulte heye. Lê di dema bê de belkî ev yek zêde bibe. Em xwe dispêrin çavkanî û kesên wêjevan û nexasim yên ku di warê wêjeya kurdî de xwedî xebat in. Dibe ku hemû çavkanî li ber destê me tune bin lê em hewl didin xwe bigihînin hemû çavkaniyên heyî.

Di beşê wêjeyî û belkî jî di beşê zanistên civakî de ferqa me ji zanîngehên din heye. Lewra di van beşan de em xwe dispêrin fehm û feraseta neteweya demokratîk a piralî, pirçandî, pirzimanî. Bi vê yekê hemangiyek di navbera çand û zimanên herêmê de tê çêkirin û ji rengên herêmê bi giştî re jî dibe bersiv.

**Dema ji bergeha mamosteyan ve hûn xwendekarên zanîngehê dinirxînin hûn xwendekarên xwe çawa dibînin? Yanî li gorî we, rewşa beşdarbûna şagirtan û asta wan di nav vê modelê de çawa ye, çawa tê nirxandin?**

**Ş.M:** Pergala me ya nirxandinê ya ku em di zanîngehê de pêk tînin ne wekî ya pergalên zanîngehên din ên Sûriyeyê ye. Li Sûriyeyê azmûnek heye ku bi awayekî formalîte xwendekar wê pêşkêş dikin. Heke ji ser 5'an puanan bigirin derbas dibin ku negirin derbas nabin. Lê di pergala me de bêhtir diyalog li pêş in, nîqaş li pêş in. Ji ber vê yekê jî em di rêjeyeke sedî 10 de amadekariyên xwendekaran li ber çavan digirin, sedî 20 jî em tevlîbûna xwendekaran a di fêrgehê de li ber çavan digirin, sedî 30 em lêkolînan ji xwendekaran dixwazin û sedî 40 jî azmûnên nivîskî ye. Bê guman cara ewil e ku zanîngeh li herêmê tên çêkirin, cara ewil e ku em bi xwe dibin xwedî îrade û em zanîngehên xwe bi rê ve dibin. Ji ber vê yekê jî ferq û cudahiyeke pir mezin heye.




Em bang li hemû akademîsyenên kurd dikin çawa ku xwedî li berxwedana Kobanê derketin wiha xwedî li avakirina Kobanê derkevin û di pêşketina Zanîngeha Kobanê de jî cihê xwe bigirin

Hemû şagirtên me bi rihetî tên tiştên di dilê xwe de parve dikin, dibêjin, xwe îfade dikin, tiştên ku fehm nekiribin ji mamosteyên xwe dipirsin. Me ew bend û mefhûmên tund ên di hişê şagirtan de bi cih bûbûn şikandin û me bi rastî jî zanîngeh kirin cihê zanistê, pêşketinê û avakirina kesayetiya şagirtan.

**Hûn dikarin behsa naveroka mufredata xwe bikin? Gelo hûn kîjan dersan didin? Çavkaniyên we (pirtûk, lêkolîn hwd.) yên dersan çi ne?**

**E.N:** Dersên ku em didin li gorî bernameya 4 salan wiha ye: Rêzimana Kurmancî, Zargotin, Xwendin û nivîsandin, Wêjeya Klasîk ya Kurdî, Derbirrîn, Wergerandin, Dahûrandina Nivîsên Wêjeyî, Zimannasî, Perwerdeya Giştî û Rêbazên Wanedayînê, Rêbazên Lêkolînê, Rexneya Wêjeyî, Projeya Derçûnê, Helbesta Nûjen û Roman. Digel van yekan hinek wane û madeyên hevbeş jî hene. Ser meselê: Zimanê Erebî jî yek-dudu tê dayîn, her wiha enstîtuya zimanan jî li vir heye, ji bo asta wan a lêkolînê bi pêş bikeve xwendekar dikarin fêrî zimanên îngilizî jî bibin. Digel vê yekê madeyên wekî Dîrok, Neteweya Demokratîk û Jineolojiyê jî wekî madeyên hevpar in û tên dayîn.

Çavkaniyên ku em xwe dispêrinê û ji bo xwe bi kar tînin jî bi piranî di nav Kurdistanê de, di nav gelê kurd de tên naskirin û heta astekê tên pejirandin. Mufredata me li ser esasên wekî dîroka wêjeya kurdî, berhemên klasîkên kurdî, kesên navdar yên ku der barê zimanê kurdî de xebat dane meşandin, pirtûkên ji her çar parçeyên Kurdistanê ku di nav pirtûkxaneya kurdî de cihê xwe girtiye û wekî çavkanî tên pejirandin hatiye avakirin.

Her wiha em hewl didin pêwendiya xwe bi hin zanîngehên din re jî xurtir bikin da ku bingeheke hevpar û rûniştî bidin dabînkirin.

**Kobanê ne tenê di dîroka kurdan de her wiha di dîroka cîhanê bi xwe de xwedî cihekî pir girîng e. Wekî Kobanê aliyê ronahî yê mirovahiyê temsîl dike. Gelo ser vê yekê erka Zanîngeha Kobanê ya di vê temsîliyetê de çi ye?**

**Ş.M:** Wekî we jî diyar kiriye êdî Kobanê ne milkê kobaniyan tenê ye. Kobanê êdî ji wateya xwe ya teng derketiye û di qada navneteweyî de jî bûye mijareke bingehîn. Çunkî şerê ku li Kobanê qewimî û berxwedana li Kobanê hat dayîn ne tenê ji aliyê zarokên Kobanê ve pêk hat. Tevahiya kesên aştîxwaz û demokrat ên cîhanê hatin û li Kobanê xwîna xwe rijandin, ji bo serkeftinê xwe kirin qurbanî. Serkeftina ku li Kobanê hat bidestxistin serkeftina mirovahiyê bi giştî bû. Ji bo vê yekê jî di destpêkê de ji her çar parçeyên Kurdistanê, gelê kurd û kesên enternasyonal û heta tevahiya cîhanê berê xwe da Kobanê û wan di Kobanê de şer kirin. Ji ber van xalan Kobanê bû milkekî cîhanî. Rojek ji bo Kobanê hat diyarkirin, meşeke cîhanî ji bo Kobanê hat lidarxistin. Ji ber vê yêkê Kobanê di asta navneteweyî de xwedî asteke pir girîng e.

Di vi warî de pêwîst e hemû sazî û dezgehên Rêveberiya Xweser xwedî li navê Kobanê derkevin û hewl bidin di asteke bilindtir de ji nû ve Kobanê ava bikin. Divê em bikaribin ji berxwedana Kobanê re bibin bersiv û bi rastî jî em bikaribin di cewherê xwe de wê berxwedanê temsîl bikin. Lewra jî peywira me ya destpêkê peywireke ehlaqî ye, dû re peywireke dîrokî ye. Da ku em bikaribin li zarokên xwe, nexasim li zarokên şehîdên xwe xwedî derkevin û di asteke pirr bilind de perwerdeya xwe pêş bixînin.

**Pirsa min a dawî ev e: "Gelo pêwistiyên we, pirsgirêkên we yên heyî çi ne? Û wekî dawî jî daxwaz û hêviyên we yên ji kurdan û raya giştî ya cîhanî çi ye?**

**Ş.M:** Bê guman pêdiviya me bi gelek tiştinan heye. Ji ber ku Zanîngeha Kobanê zanîngeheke nû ye. Di destpêkê de pêwîstî bi akademîsyenan, bi kesayetên welatparêz ên di asta zanistiyê de li pêş in heye û ew kes dikarin di van biyavan de ji Zanîngeha Kobanê re bibin alîkar.

Her wiha di aliyê labaratuarê, aliyê alav û cîhazên pêşketî de jî hin kes dikarin bibin qenalek ku bikaribin van tiştan bigihînin Zanîngeha Kobanê. Pêwîstiya me bi van yekan heye.

Di dawiyê de jî wekî bangekî li kurdistaniyan, bi taybet jî bo akademîsyenên me yên kurd ên li derveyî welat, kurdên me yên welatparêz ên li derveyî welat xwesteka me ji wan ew e ku çawa di berxwedana Kobanê de xwedî li Kobanê derketin û her yek bû sedem ku berxwedana Kobanê bi ser bikeve îro jî careke din cihê xwe di avakirina Kobanê de û di pêşketina Zanîngeha Kobanê de jî cihê xwe bigirin. Çi di aliyê madî çi jî di aliyê manewî de dibe.

Her wiha daxwaza me ji saziyên navneteweyî, bi taybet saziyên ku bi perwerdeyê re têkilîdar ew e ku komîteyên xwe bişînin vir, serdana zanîngehên me bikin, materyalên ku em di mufredata xwe de cih didin wan bişopînin. Da ku em bikaribin rewakirinekê bidin van zanîngehan û bawernameyên van zanîngehan li her derê werin qebûlkirin.


Daxwaza me ji civaka me jî heye ku bila ji zanîngeha xwe bawer bin û xwedî li zanîngeha xwe derkevin. Lewra rewakirina zanîngehê pêşî bi biryara civaka me pêkan e.

Em dawî de jî spasiya xwe li we dikin ku hûn dengê me digihînin gelê me û bizanibin ku deriyê Zanîngeha Kobanê jî ji her kesî re vekiriye. Slav û rêz ji bo we.

# Analîzek li ser romana ‘Ev rê naçe bihuştê’

Elîf Gûn

Ev Rê Naçe Bihuştê, ji weşanên Lîsê derçûye, di sal 2019’an de hatiye weşandin û roman 216 rûpel e. Romana Yildiz Çakar ya bi navê “Ev Rê Naçe Bihuştê” ji heft beşan pêk tê. Beşa yekem “Zemanê Winda”, beşa duyem “Jîyanên Winda”, beşa sêyem “Xezeba Tariyê”, beşa çarem “Nigehdarên derîyan şîyar bûn, heft derî li dilan vebû”, beşa pêncem “Erd berî wê surrê natebitî”, beşa şeşem “... cuda kir yek ji heftan, ji hev kir doj û cenetê”, beşa heftem “Gîyanên nemir, nobedarê li derîyê dil” e. Di beşa yekem de, li ser wendabûna zeman, pîrozî û girîngiya ronahiyê ye di serdema tarîperestan de. Roman wisa dest pê dike û di beşa heftan de azadiya raman çand û wêjeya resen bi dawî dike. Nivîskar di romanê de behsa çanda gelê kurd û bi taybetî çanda kevn ya gelê kurd ê êzîdî kiriye. Naveroka romanê dîroka ferman û komkujiya gelê êzîdî ye. Yek ji xala herî girîng ya romanê ev e ku behsa fermana herî dawî ya ku serpêhatiyên gelê êzîdî û êşên wan dike. Ji beşa yekem heta beşa heftan nivîskara me, xwendevan bi mijarên çanda resen re, bi awayekî zelal û vekirî girêdana axê û birdoziya gelê kevnar ya bi welat re dibe cîhaneke servekirî. Di beşa heftan de em rastî felsefe û ola êzîdiyan a pîroz tên. Wiha girêdana beşa di romanê de cihekî pir girîng digire. Her beşek bi beşa din ve girêdayiye. Wisa nivîskara me di beşa dawî de behsa çanda gelê êzîdî dike. Bi dengê Defê Şibaban û derbasbûna cihên pîroz ê perestgehên olî û vegera ber bi hembêza xweza û dîroka qedîm ya gelê êzîdî, nivîskar romana xwe bi dawî dike. Di romanê de pir leheng hene. Ez ê lehengan bi hin serenavan dabeş bikim. Serleheng, lehengên norm, fon û kart. Di romanê de du serleheng hene. Yek Şemsîxan û ya duyem dayika wê Xasê ye. Vebêjera me jî Şemsîxan e. Em bûyeran bi dev û çavên Şemsîxanê dibihîsin û dibînin. Em dikarin taybetiyên serleheng wiha bikin. Serleheng, derûnî, hest û ramanê wan û jiyana wan bi teferûat û awayekî gelemperî têne vegotin. Dibe serleheng zêde ne zindî jî bin lê belê zêde tevlihev in. Serleheng, di nava çîrokê û tevgera bûyere de lihevxistin, guherînan çêdike. Di xwendevan de bertekan çêdike û bi temamî berhêlî dike. Serlehenga duyemîn Xasê têkilî bûyeran dibe. Ji Şemsîxan re çîrokan dibêje. Tenê ne çîrok, çand, ol hwd. Hemûyan tîne ber çavê xwendevan. Lehengên norm, ji xencî armanca romanê, di romanê de ji bona ku armancekê bi kar bînin dixuyên (Stevick, 2017: 179-181). Di romanê de lehengên norm, Marjen, Keleşo, Zîzê, Semîra, Alê, Çinê ne. Keleşo hezkiriyê Şemsîxanê ye. Marjen pisîka Şemsîxanê ye. Hevala wê ya herî baş e, di başiyê de jî di xerabiyê de jî li cem Şemsîxanê dimîne. Lehengên Fon, di careke de nivîskar dikare lehengên fon bixe bingeha romanê, di carekê de dikare kûr bibin, lê belê bi wateya ferdî girîngiyê nade, piranî wek bênav dimînin. Di romanê de Reşayî bênav in. Tenê dengê wan tê bihîstin. Di pêşî de nivîskar wan teswîr dike, tenê dengê wan tê bihîstin. Roman bi çîroka pirbinêrîn hatiye nivîsandin. Xwîner, di dîtbariyê de guhdariya kesan nake, bi awayekî nerasterast bin jî bi ava dilê lehengên xwe û çavdêriya wan re di têkiliyê de ye. Wekî encam di romanê de teknîkekê derdixe pêş. Xwîner, dikeve gerdûna lehengan, guhdariya axaftina wan dike û tevgerên wan dibîne. Bi kurtasî, wekî ku di leyîstikan de ye bi kar bîne, pêşiya sehneyekê beşên aşkereker jî ji aliyê nivîskar tê dayîn an di nav fikr û gotinên lehengî de îfadayekê dibîne. Bergeh, kê dîtiye mesele û nasnameya vebêjer, kê diaxife, tevliheviya di navbera wan de çêdibe ji ber wisa xemgîn dibe, çimkî di her du meseleyan de divê cuda cuda bê tesnîf kirin. Em dikarin mekana bikin du beş. Di romanê de ya yekemîn ev e ku bi zêdeyî li ser vegotinê ye, mekana derdorî ye. Di romanê bi piranî yên ku li teswîrê ye tê gihîn, tê ber çavê me. Nivîskar, bûyerê berî ku bibêje her tiştî teswîr kiriye. Ne ji yek aliyî ve bi gelemperî teswîr dike û vedibêje. Dema ku nivîskar mekanan teswîr dike, tesîra mekanan ya li ser lehengan tîne ber çavê me. Mekân carna hîsên wekî aramî, xemgîniyê li ser lehengan çêdike. Nivîskar girîngiya mekanan wiha tîne ber çavê me. Li gor xwendina me ya vê romanê em dikarin bibêjin ku di vê romanê de babetên polîtîk, siyasî, civakî û nasnameya neteweyî yan nijadî derdikevin pêş xwendevanan. Nivîskar, dema reşayiyê teswîr dike, bi awayekî pir qirêj, xerab, zordar, zilmdar teswîr dike. Lêbelê lehengên jin him şervan, him pasîf, him serbixwe hatine afirandin. Di romanê de leheng piranî jin in. Di çîrokên jinên kurd (kurmanc) de nasnameyeke jinane, li dora bûyeran bicihkirina sekna jinên kurd jî li ber çavan in. Lehengên jin yên ku me qal kirine ji nav civak û çanda kurdan in. Divê jinên kurd ji bo hawirdora xwe ya azad têbikoşin û dengê xwe bidin bihîstin. Îro çend hedef hatine destnîşankirin ku hin tevgerên netewî yên kurd wekî pesnê têne dîtin. Ji nû ve avakirina desthilatdariyê, afirandina civakeke nû ya li ser bingeha wekhevî û bêîstismar, azadiya derbirînê, ol û rêxistinê. Wekheviya zayendî, armanca guhertina femînîst a li hember zehmetiyan ji hêla rojeva neteweyî ve berfirehtir tê dîtin. Divê mafê çarenûsî mafeke guncav be, divê ne tenê xeyalî be. Zanayeka hiqûqê ya femînîst hewl dide ku nêrînên jinan têxe nav analîzeke qanûnî. Tevî ku baviksalarî li deverên cihê yên cîhanê bi awayên cuda xwe dide der, ew diyardeyeke gerdûnî ye. Em di romanê de dibînin ku ew jinên kurd wekî sembolên pasîf bi rolên zayendî yên kevneşopî di qada xwe ya taybet de destnîşan dikin. Gava ku jinên kurd wekî “dayik”, “şervan”, “azad” têne birûmetkirin, ew bi van rolên xwe ve sînordar û pasîf in. Karakterkirina jina kurd a ku pir caran tê bikaranîn di çarçoveyeke dîrokî û civakî de xwedî wate ye. Bi rastî taybetmendiyên vegotinê yên jinên ku di heyameke dem û erdnîgariyê de dijîn, di serî de bi nihêrîna li avahiya civakî, aborî û çandî ya di çarçoveya vê dem û deverê de û guherîna ku ew bi demê re derbas bûne bi bandorkirina hevûdu ve têne vegotin.




***Çavkanî***
***Çakar, Y. (2019). Ev Rê Naçe Bihuşte. Amed: Weşanên Lîs.***
***Stevick, P. (2017). Roman Teorisi. Ankara: Akçağ Yayınları.***



Seyidxan Anter

# Penêrê hefnikî

Her cara mijara perwerdeya bi zimanê kurdî di rojevê de be, siyasetmedarên partî û rêxistinên komara tirk, radihêjin gopalên xwe yên bi sêhr û cambaziyan dikin.

Yek ji wan Muharem Înce ye. Muherem Înce beg xwest bibe Serokomar. Bi ser neket û îsal partiya xwe Memleket Partisi ava kiriye. Der barê pirsgirêka perwerdeya bi zimanê kurdî, Muharem Înce du tiştan ji me re dibêje;

**1-** Zimanê kurdî têra pedagojiyê nake.

**2-** Loma jî dilê xwe bi zarokên kurdan dişewitîne.

Dilşewatî meziyetek çê ye, dilşewatiya zêde jî derziya jehrê ye. Hin xwedî kole jî dilê wan bi koleyan dişewitî lê ne dijî bindestiyê bûn. Di serdema me de dilên gelek mirovan bi segan (kuçikan) dişewite, lê çaxa kuçik nesax dikevin, gelo çi tê serê wan? Bi derziyek jehrê mirov wijdanê xwe "şa" dikin.

Em vegerin mijara xwe. Zimanê kurdî bi pedagojiyê digunce an na? Muharrem Înce ji berê de di televizyonan de digot kurdî têra perwerdeyê nake û anha jî dibêje; zimanê kurdî bi pedagojiyê re nagunce. Me li pîşeya Muharrem Înce pirsî, ciwamêr mamoste derket.

Vêca yek ji xalên fizîkê metal in. Kurdî wiha dibêjê: "Metal madenek bingehîn e. Metal li çiyan û di bin erdê de hene. Rûyê metalan diçirise, ji herka kahrebê (elektrikê) û germahiyê re bikêr tên. Hesin, sifir, zîv û zêr hin cureyên metalan in. Metalên sivik û metalên giran hene. Her wiha li gor bandora dor û berê wan jî hin ji wan bihadar û hin jî ne bihadar in."

Kimya di derbarê molekulan de dibêje: "Hemû made ji çeniyên biçûk pêk tên. Navên van parçeyên biçûk atom in. Piraniya caran grupên atoman bi hev re ne û ji wan re molekul tê gotin. Di molekulek avê de atomeke oksîjen û du atomên hîdrojenê hene."

Biyolojî ji me re kayina ajalan vedibêje: "Tenê ajalên bi kuloç û sim kayinê dikin, ango du cara xwarinê dicûn, yek mezin û sisê biçûk çar zikên wan hene."

Em nizanin ev xalên me li jor gotin li gel pedagojiyê digunce an na? Lê xalek ji me ve diyar e, li cihê ziman hebe li wir pedagojî jî heye, zanistên ziman û perwerdeyê wiha dibêjin . De werin em hinekî berê xwe bidin gopalê bi sêhr û cambaziyê, pedagojiya Muharrem Înce û hevalbendên wî.

Tiştê em dizanin, pedagojî disîplînek zanistiya perwerde û fêrkirinê ye, nemaze ya zarokan, ji asoyek sosyal û çandî ve. Civatên pêşketî behsa pedagojiya rojane û ya akedemîk dikin û dibêjin ji fêrkirinê re pêwistî bi retorîk û teknîka pêşkeşkirinê û demokrasiyê heye. Bingehê pedagojiyê Arîstotales daniye. Li gor metoda Arîstotales gerek şagirt bi xwe bifikire, gelek pirsan ji xwe bike û ji bersiva wan fêr bibe.

Li gor zanyaran zimanê kurdî di nav zimanên dewlemend yê cîhanê de ye. Behsa rêza nehêmîn dikin. Li herêma federal a Kurdistanê , li Iraqê perwerde bi zimanê kurdî dibe. Van rojan me nûçeyek di rojnameya Xwebûnê de xwend. Li gor agahdariyê, li Rojavayê Kurdistanê (Binxetê) ezmûnên perwerdeya asta lîseyê bi zimanê kurdî dest pê kiribûn. Gelo em ji rastiyê an jî ji qisê qor bawer bikin? Dostekî me heye, ew jî rastî ye. Ma ne wisa Muharrem Înce beg ?



# Bi yek dengî daxwaza yekitiya Kurdistanê kirin

## Ji bo şermezarkirna êrîşên li ser axa başûrê Kurdistanê li welat û derveyî welat gelek kes derketin qadan û nerazîbûnên xwe anîn ziman



Navenda Nûçeyan

Li dijî lihevkirina Tirkiye û PDK'ê li welat û derveyî welat her roj dengê gelê kurd bilindtir dibe. Gel, sazî, siyasetmedar, parlamenter, hunermend, rewşenbîr û gelek pêşmerge jî her diçe nerazîbûnên xwe yên li hemberî hevkariya Tirkiye û PDK'ê tînin ziman.

Hefteya borî li hemberî dagirkirina axa Başûr û polîtîkayên PDK'ê, 180 pêşmergeyên ku hê li ser kar û peywira xwe bûn, biryara çekdanînê, girtin. Li gor agahiyên hatibûn parvekirin 180 pêşmergeyên li Kampa Perwerdê ya Etrûşê ya girêdayî bajarê Dihokê diman gotin 'Em ê li dijî gerîla şer nekin' û çekên xwe danîn.

**Pêşmergeyeyê Dêrîn**

Pêşmergeyekî Dêrîn ê bi navê Ebdullah Hemed jî der barê dagirkirina axa Başûr de axivî û nerazîbûnên xwe anîn ziman. Ebdullah Hemed da zanîn astengiya herî mezin a li pêş dagirkerî û ji nûve zindîkirina xewna dewleta Osmanî ya Tirkiyeyê PKK'e ye û wiha got: "Pêwîst e bêdeng nebin û li dijî dagirkeriya tirk gelê kurd rabe ser pêyan."

**Helwesteke cidî**

Hemed diyar kir ku armanca dewleta tirk jiholêrakirina statûya başûrê Kurdistanê ye û wiha domand: "Her çiqas statûya herêmê kêmaniyên wê hebin jî lê hewce ye ji dagirkeriya tirk were parastin. Ji ber ku dewleta tirk dixwaze kurdan bi yek carî tune bike. Ji ber vê yekî bi awayekî lezgînî divê hikûmeta herêmê li dijî dagirkeriya dewlete tirk bêdeng nemîne û helwesteke cidî nîşan bide."

**Meşa hunermendan**

Hunermend, rêxistin û aliyên siyasî yên başûrê Kurdistanê di meşeke girseyî de li Silêmaniyê bi yekdengî daxwaza bi dawîanîna dagirkeriya dewleta tirk a li ser başûrê Kurdistanê kirin. Her wiha dijbertiya xwe ya li dijî derxistina şerê kurd bi kurd nîşandan.

**Nasir Rezazî**

Hunermend Nasir Rezazî yê ku tev li meşa li dijî dagirkerî û hewildanên şerê kurd bi kurd a li Silêmaniyê bû, axivî û wiha got: "Ev çalakî peyama hemû hunermendên başûrê Kurdistanê û derveyî Kurdistanê ye. Da ku êdî xwîna kurd bi destê kurd neyê rijandin. Bila partiyên kurd rûnin, bi diyalog û aştiyê pirsgirêkan çareser bikin."

Nasir Rezazî da zanîn ku divê ji bo derxistina dewleta tirk ji xaka Kurdistanê, kurd bi cesaret tevbigerin û ev tişt anî ziman: "Em naxwazin kurd bi destê kurd were kuştin. Divê hewl were dayîn êdî tu hizbek kurdî şerê hizbek din a kurdî neke."

## Şandeya Aştiyê bi Tevgara Goran re hevdîtin pêk anî

Ji bo pêkanîna eniyekê li dijî dagirkeriyê û hewldana ji bo lihevnêzîkbûna hêzên siyasî ya li dijî dagirkeriyê Şandeya Aştî û Azadiyê ya Navneteweyî serdana Serokê Tevgera Goran Omer Seyid Elî kir.

Li Silêmaniyê Şandeya Aştî û Azadî ya Navneteweyî li Navenda Giştî Tevgera Goran bi Serokê Tevgera Goran Omer Seyid Elî û çend endamên din ên Tevgera Goran re hevdîtin kir.

Armanca hewldanên Şandeya Aştî û Azadî ya ku ev çend roj in li başûrê Kurdistanê li herêmê pêkanîna aramî û avakirina eniyek li dijî dagirkirina dewleta tirk a li ser xaka başûrê Kurdistanê ye. Her wiha çareserkirina aloziya li herêma Kurdistanê heye.

Piştî hevdîtinê şandeyê serdana gora damezrînerê Tevgera Goran Newşîrwan Mistefa kir.

Şandeya Aştî û Azadî ya Navnetewî ji çend welatên cuda yên Ewropayê ji bo piştgiriya gelê kurd û li dijî dagirkeriya dewleta tirk hatine başûrê Kurdistanê. Di 14'ê hezîranê de li Hewlêrê kampanyaya 'Însiyatîfa Navneteweyî ya ji bo parastina Kurdistanê û dijî dagirkeriya Tirkiyeyê' ragihand.

# Guven: Roja şikandina tecrîdê nêzîk e

Navenda Nûçeyan

Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê, di 27'ê Mijdara 2020'î de, bi armanca bi dawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 22 sal in li Girtîgeha Îmraliyê tê girtin û şermezarkirina binpêkirinên mafên mirovan ên di girtîgehan de zêdebûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Çalakiya girtiyan zêdetirî 200 roj in bi biryardarî bi koma 40'emîn berdewam dike.

Têkildarî çalakiyên greva birçîbûnê Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Leyla Guven ku parlamenteriya wê hate desteserkirin û 22 sal û 3 meh cezayê girtîgehê lê hate birrîn, ji Girtîgeha Jinan a Xarpêtê nameyek weşand û bang li raya giştî kir.

**Di neçareseriyê de israr dikin**

Leyla Guven destnîşan kir ku desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê pirsgirêka kurd girantir dike û ev tişt got: "Her ku ew di neçareseriyê de israr dikin, em mezintir dibin, êşa xwe dikin



hêz û dibin gelê herî birêxistinbûyî, têgihiştî û polîtîk ê Rojhilata Navîn. Em birînên xwe dipêçin û têkoşîna xwe dewam dikin. Ji ber ku em dizanin di dawiya vê rêwîtiyê de jiyaneke demokratîk, ekolojîk û azadîparêziya jinan li hêviya me ye."

**Bi 10 hezaran...**

Leyla Guven bi bîr xist ku li her devera kurd lê ne pêngava 'Dem dema azadiyê ye' bi rê ve diçe û wiha axivî "Gelê kurd û dostên wan daxwazên me li qadan bi lêv dikin. Tînin ziman ku nêzî 50 milyon kurd bê statu hatine hiştin û êdî vê rewşê qebûl nakin. Birêz Ocalan 22 sal in di nava tecrîdeke giran de ye û tevî vê jî ji bo çareseriya pirsgirêka kurd li muxatab digere, lê belê cidiyeta dewletê li hemberî xwe nabîne."

**Dem dema azadiyê**

Leyla Guven da zanîn ku pêngav bi biryardariyeke mezin dewam dike û wiha pêde çû: "Di vê çarçoveyê de bi deh hezaran girtiyên siyasî yên li girtîgehan gotin 'Dem dema azadiyê ye' û ji 27'ê Mijdara 2020'î û pê ve ketin greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger. Hûn jî zanin ku zindanan di dîroka me ya têkoşînê de berpirsyariyên xwe yên li pêşberî gelê me yê hêja her tim bi fedakarî bi cih aniye. Ji ber vê yekê gelê kurd Mazlûm Dogan, rojiya mirinê ya 14'ê Tîrmehê, Çaran, Sakîne Cansiz, Zulkuf, Ayten û bi sedan leheng ji bîr nekiriye. Îro jî bi hezaran girtî tev li nava vê çanda zindanê bûne ku bi wêrekî bi ser mirinê ve diçin. Hûn jî dizanin ji bilî bedena xwe derfeteke girtiyan nîne ku çalakiyan pêk bine. Yê ku li derve dengê me bide bihîstin hûn malbatên me yên hêja û gelê me ne. Bêguman haya we ji vê dorpêç û faşîzmê heye. Lê em dizanin ku we bi salan gelek dorpêç, asteng û tarîtî ji holê rakirine. Hîn tiştek nehatiye çêkirin ku karibe li ber hêza gel rabe, hêza gel têk bibe. Ji ber vê yekê hûn ê li derve bibin deng û nefesê me. Em di wê baweriyê de ne ku ji bo bicihanîna daxwazên mafên xwe, ji destê we çi bê hûn ê bikin. Di vê mijarê de baweriya me bi we bêdawî ye."

**Xwedîderketina li zindanan**

Leyla Guven di dawiya nameya xwe de ji bo xwedîderketina li zindanan bang li gel kir û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Eger em li hundir û hûn li derve dengê xwe bilind bikin, wê tecrîd bê şikandin û azadî bê misogerkirin. Ew roj bi rastî jî nêzîk e. Em ê bi moral û biryardariyê vê bi ser bixînin. Em bang li gelê xwe yê hêja dikin ku bi hewldaneke mezin xwedî berxwedana li zindanan derkevin."

## Îxanet êşa herî dirêj e

Mehmet Akdogan

Kurd ji çekan, îxanet û înkarê kevintir in. Koka wan ji zilmê jî wêdetir e. Ew di astengiyên zilm û zoriyê de keliyane. Ew hemû kevin û beqem kirine. Koka wan ji pazdeh hezar sal Berî Zayînê tê û ew Berî Zayînê bi deh hezar salan bi hemû rengê xwe diyar bûne. Kurd ji bo zimanê arî sitûna herî qaîm û esas in. Bi sumeran re derketin ser dika dîrokê û Hûrî ne. Sumer Mezopotamyaya Jêr û kurdan jî Mezopotamyaya Jor girt. Wan bajar ava kirin û xwe guherandin. Kurdan xwe di nava çiyayan de bi cih kir û çanda Neolotîk û Zerdeştî parast. Ango weke tu kesî îxanet li koka xwe nekir. Ji ber wê yekê bi qasî çiya bilind, qedîm û kifş in.

Lê îxanet...

Îxanet, êş e. Êşeke ku ji nava bedena Kurdistanê qet derneketî ye. Ji Harpagos û heya niha li ber hemû pêşketin û nirxên kurdan bûye xencereke herî dijwar û di destê dijminê wan de hejiyaye. Dewletên dagirker hemû emeliyatên xwe li ser kurd û Kurdistanê bi wê xencerê kirine. Parçebûna Kurdistanê, parçebûna kurdan û zagonên dijminan bi wê xencerê pêk hatine. Ji ber wê yekê her dem êş û jan e bo kurd û Kurdistanê.

Bê guman di her sedsalan de xayîn ji bo kurdan hatine avakirin û pêşketinên wê demsalê bi wan têk birine. Lê di dîroka kurdan de tu îxanet weke ya mala Barzaniyan temen dirêj nebûye û di tu dem û dewranan de zirara ku mala Barzaniyan daye kurd û Kurdistanê kesê nedaye. Mala Barzaniyan li her çar parçeyên Kurdistanê, bi her çar dewletên dagirker re xebitiye. Şopên îxaneta mala Barzaniyan li her çar parçeyê Kurdistanê hene. Bi desteka dewletên dagirker hem weke rêberên kurd ew li ser lingan hiştine û dema hêzek ji bo kurd û Kurdistanê derketiye holê bi wê malbatê ew têk birine. Di dema firehiyê de weke şirîkên serkeftinên kurdan xwe daye pêş û dema tengaviyê de dest jê berdaye û reviyaye û çûye. Di vê hêlê de ew qas mînakên wan hene ku li her derê derdikevin pêşiya mirov. Ji Mehabadê heya Şengalê û hatina DAIŞ'ê.

Di dîrokê de tu kesî bi qasî mala Barzaniyan xweşmêrên kurdan radestî dijminên xwe nekirine û tu kesî bi qasî wan lehengên kurd nekuştine. Weke Doktor Şivan, Elî Esker, Miho Gewda, bi sedan şervanên YNK û PKK'ê.

Mala Barzaniyan bi qasî tu malbatên kurdan şehîd û bedel nedane. Lê tu malbatên kurd bi qasî mala Barzaniyan mal û milkê kurd û Kurdistanê nediziye û nexwariye. Tu malbatên kurdan weke mala Barzaniyan dewlemend nebûne. Di tu demên dîrokê de kesî bi qasî mala Barzaniyan, kurd û Kurdistanê nefirotiye. Çekên ji bo parastina Kurdistanê hatine firotin, gaza kurdan, çiyayên kurdan, bajarên kurdan, partiyên kurdan û lehengên kurdan hemû bi dest wê malbatê hatine firotin. Lê tu malbat weke wê malbatê xwe xwediyê kurd û Kurdistanê nedîtiye... Dema kurd û Kurdistan ew weke xwediyê xwe nedîtibe wan dest bi îxanetê kiriye û sînor li ber îxaneta xwe rakirine.

Bes kurd bi nexweşiya xwe hesiyane. Êşa îxanetê nas kirine, dermanê xwe bi xwe çêkirine û dê îxanet êdî wan nekuje. Ji bo ku di dîroka kurd Kurdistanê de kurdan tu deman ew qas xwe nas nekiribû. Ew qas îxanet û êşa xwe danehurandibû. Di tu dem û dewranan de berxwedaneke ew qas temendirêj û canbexşane pêk neaniye û ew qas temendirêj temenê lehengiyê nemir nekiriye. Di nava rehên her kurdekî li çiya û newalên welatê wan, di kolanên bajaran de, li zindan û dîasporayê, ciyê ku kurdek lê be kînek li hemberî îxaneta wê malbatê heye. Divê ew kîn rabe da zû îxaneta mala Barzaniyan bi hemû dagirkeran re ji holê rake. Kurd tu caran ew qas nêzî serxwebûnê nebûne û ew qas bi bawer nebûne ku dê îxanet û dagirker têk biçin. Pîvana li hember derketina vê îxanetê û mildana berxwedana lehengên canbexşîn dê siberoja kurdan kifş û ronî bike. Ji ber vê yekê divê kurd bêhtir baldar û çalak bin.

# ‘Girtina nûneran li dijî protokolê ye’

**Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê ji 10’ê hezîranê ve nûnerên Rêveberiya Xweser girtine û heta niha bi tu awayî der barê wan agahî nehatiye dayîn. Têkildarî mijarê gelek sazî û siyasetmedaran bertek nîşan dan û gotin ew ji jiyana wan bi guman in**

Navenda Nûçeyan

Bi gurrbûna êrîşên dewleta tirk a li ser herêma Başûr bêdengiya hikûmeta Bexda û Hewlêrê jî bi awayekî eşkere derdikeve holê. Helbet her çiqas ku der barê êrîş û dagirkirina Tirkiyeyê de PDK wek bêdeng xuya bike jî bi hemû kiryarên xwe yên li hember herêmên Metîna, Zap, Avaşînê hevkariya xwe ya bi Tirkiyeyê re aşkera dike. Helbet kiryara girtina nûnerên PYD’ê mînaka berbiçav a hevkariya PDK-Tirkiyeyê ye.

Hikûmeta herêma Başûr di 10 hezîranê de li Hewlêrê nûnerê Rêveberiya Xweser Cîhad Hesen, endamên têkiliyan ên Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) ên li Hewlêrê Mistefa Xelîl û Mistefa Ezîz dema ku ji bo pêşwazîkirina mêvanan diçûn balafirgeha Hewlêrê girtibûn.

**‘Em ji jiyana wan bi guman in’**

Di nava hefteyê de têkildarî girtina endamên xwe de Nûnertiya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Nûnertiya PYD’ê ya li başûrê Kurdistanê jî daxuyanî dan. Di daxuyaniyê de hat gotin ku ji 10’ê hezîranê ve bi aqûbeta nûneran nizanin û wiha gotin: “Ji wê rojê heta îro bûye hefteyek tu agahî ji wan nehatiye û tu pêwendî bi wan re çênebûye. Gihîştiye wê astê ku em ji jiyana wan bi guman in.”

**Astengkirina xebatên dîplomatîk in**

Nûnertiya Rêveberiya Xweser û ya PYD’ê di berdewama axaftina xwe de dest nîşan kirin ku di pêvajoyeke wisa metirsîdar û girîng de kiryarên bi vî rengî tê wateya astengkirina xebatên dîplomatîk û siyasî û ev tişt anîn ziman: “Ev yek dikeve çarçoveya hewldanên qelskirina destketiyên şoreşa Rojavayê Kurdistanê. Ev kiryar bi tu awayî nakeve xizmeta yekrêziya kurdî û helwesta neteweyî. Berevajî wê dikeve xizmeta plangeriya neyarên kurdan. Bi taybetî dewleta tirk a ku bi hemû rêbazên xwe dixwaze dagirkeriya xwe li ser Kurdistanê fireh bike.”

**‘Girtina nûneran li dijî protokolê ye’**

Girêdayî mijarê nûnerê Nivîsgeha Têkiliyên Giştî ya Partiya Sûriya Pêşerojê ya Tebqayê Musene Ebdulkerîm jî axivî û wiha got: “Girtina nûnerên Rêveberiya Xweser ji hêla hikûmeta başûrê Kurdistanê ve li dijî bingehên siyaset û protokolên lihevkirî ne ku di navbera Rêveberiya Xweser û PDK’ê de çêbûn.”

Musene Ebdulkerîm pêşwazîkirina PDK’ê ya ji bo Itîlafa Sûriyeyê ku bi piştgiriya Tirkiyeyê pêk tên şermezar kir û ev tiştî got: “Lê li gel vê PDK nûnerên Rêveberiya Xweser û PYD’ê digire.”

**Destê PDK’ê destê hevkariyê ye**

Ebdulkerîm da zanîn ku divê PDK xeteriya girtina nûnerên Rêveberiya Xweser baş bizane û wiha anî ziman: “Li gel wê jî destê PDK’ê bi awayekî eşkere di êrîş û komployên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de û dûrketina ji bo yekitiya kurd de heye.”

Ebdulkerîm diyar kir ku tenê girtina nûneran tenê xizmeta herî mezin ya ji bo armancên dewleta tirk e û bang li aliyên peywendîdar ên başûrê Kurdistanê kir ku girtiyan serbest berdin.

**Dijminatî gihaşt girtina nûneran**

Gerînendeyê Nivîsgeha Partiya Nûjen û Demokratîk a Tebqayê Mehmûd Etê têkildarî mijarê axivî û ev tiş bi lêv kir: “Helwesta hikûmeta başûrê Kurdistanê ya li hemberî Rêveberiya Xweser ji destpêkê ve cihê mixabiniyê bû û di demên dawî de jî xirabtir bû. Heta dijminatî gihaşt girtina nûnerên Rêveberiya Xweser a li hundirê başûrê Kurdistanê ku pîvanên di navbera aliyên siyasî de bin pê dike.”

**Ev bi serê xwe xiyanetek e**

Mehmûd Etê bal kişand ser hevkariya di navbera PDK û dewleta tirk a li dijî kurdên li tevahiya herêman de û ev şîrove kir: "Ev bi serê xwe xiyaneteke eşkere ye û qirkirina gelê kurd dike armanc, mînaka wê jî kiryarên dagirkeriya tirk li başûrê Kurdistanê pêk anî."

Etê banga eşkerekirina çarenûsa nûnerên Rêveberiya Xweser û PYD`ê kir, her wiha bang li PDK`ê kir ku helwestên xwe yên der barê Rêveberiya Xweser de di ber çavan re derbas bike da ku parastina yekitiya gelê kurd li tevahiya herêmên Kurdistanê pêk were.





# Divê ava çem nebe mijara polîtîkayê

Navenda Nûçeyan

Tirkiye li dijî gelên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê polîtîkayên xwe yên dijmirovahî didomîne. Wek tê zanîn ji 27’ê çileyê ve Tirkiyeyê ava Çemê Firatê li ser herêmê qut kiriye. Qutkirina avê li herêmê dibe sedema encamên xirab ên wek çandinî, tunebûna ceyran û destpêkirina nexweşiyan. Di van mehên dawî yên havînê de li nexweşexaneyên Kobanê hejmara kesên ji ber avê jehrî bûne roj bi roj zêdetir bûn. Her wiha tunebûna avê zirareke mezin digihîne niştecihên herêmê yên nêzî çem; çi di qada debarê de çi jî di qadên çandî masîvaniyê de.

Hevserokê Nivîsgeha Enerjiyê ya Tebqayê Welat Derwîş der barê mijarê de axivî û diyar kir ku ji 27’ê çileyê ve di mîqdara berdana ava çem de tu guhertin tune ye.

Welat Derwîş da zanîn ku ji ber kêmbûna rêjeya avê bandorên neyînî zêde bûne, her wiha av qirêj bûye, zarok bi jehriyê ketine, saetên dayîna kehrebê her çûye kêm bûne û hwd.

Derwîş destnîşan kir ku koordînatorê kar û barên mirovî yê taybet ê Sûriyeyê Umran Rida serdana bendava Firatê kiriye ji bo ku sûcên Tirkiyeyê li dijî gelan pêk tîne, ji nêz ve bibîne û ev tiştî anî ziman: “Ev serdan piştî gelek rapor der barê bandorên neyînî yên li dijî herêmê yên di encama qutkirina avê de li ser herêmê û bangên welatiyan ên ji rayedarên NY`yê ku destwerdanê bikin û rê li pêşiya kerasetên din bigirin, pêk hat. Lê li gel van bangên me yên ji NY’yê re jî tu helwest ji aliyê wan ve nehatiye nîşandan. Bi vê yekê ve girêdayî Tirkiye di qutkirina avê de israr dike.”

Her wiha Welat Derwîş amaje pê kir ku nabe dosya avê were polîtezekirin, ji ber ku xizmeta civakekê dike, ne xizmeta ferdekî dike.



Destar

Ehmed Pelda

# Çand bingeha qanûnan e

Rabûn, rûniştin, danûstendin, kirrîn û firotin, şer û aştî, navbeynkarî, lihevkirin, jihevcudabûn,

Her cure kar û bar û her wiha reng û rûçikê bawermendî, cîhêrengiya ziman û zanînê wekî teşeyê jiyanê bi tevayî nîşana çanda gel, rêgeza çêkirina qanûn û destûrnameyan jî eşkere dike.

Di dema îroyîn de dewletên şareza gava bixwazin qanûnan amade bikin giraniyê didine sazûmaniya çand û civakê. Li gorî reng û rûçikê civakê qanûnan saz dikin û destûrnameyan pêşkêş dikin. Lewma her gav nabza civatê tê girtin, lêkolînên der barê bûyerên diqewimin û nêzîkdayîna civakê tê pîvandin. Li ser vê bingehê hîmê qanûnan tê hûnandin.

Bi demajoyê re veguherîna çand, aborî, teknolojî û civatê riya veguherîna qanûn û rêznameyan jî bi xwe re tîne. Lewma qanûn ne dogma ne û ne jî tiştekî pîroz in. Dewsa wê navgînên di xizmeta aramî û aştiya civakê de ne. Heke berevajî vê, wek tiştekî pîroz bê nîşandan û destûra gûherîna wê neyê dayîn, wê çaxê dibe dogma, tabû ango perestgeh.

Welatên ji hêla civakî, aborî û siyasî ve paşdemayî, an jî muhafazakar qanûnan wek dogma dibînin. Dewsa ku wek navgîna çareseriya pirsgirêkan bikin, wek ayetên pirtûkên pîroz dibînîn û pê re serê xwe ditewînîn. Dewsa ku li ser bifikirin û bipîvin ku kêrî civatê tê an na, bêhtir rastiya qanûnê dûrî lêpirsînê digirin û kes û beşên civakê yên guherînê dixwazin wek bêbext û dijber pênase dikin. Bi şidyayî qanûnan req dikin û bi navgînên wek nijadî, olî û yekitiya dewletê dorpêç dikin; çi al, wêne, logo û sembol hebin hemûyan radikin û dixine çavê gel.

Wekî qanûna şer-î ku li ser stunên fermana ayetên dînî hatiye avakirin. Dîsa makeqanûnê li ser pênasekirina nijadî hatine runiştandin zîq in, hişk in, req in û guherîna wan wekî hilweşîna dewletê û parçebûna netewê dibînin. Lê belê di rastiya kêşûbeşa jiyanê de kes ne van qanûnan xwedî derdikeve, ne jî pê haydar e. Ev rastî tenê ne ji bo kesekî rêzê, ji bo rayedar û berpirsiyarê qanûnan jî wisa ye. Da ku heqîqeta jiyanê şert û mercên xwe ferz dike û divê li gor hewcedariyên demajoyê biryar bên dayîn. Lê mixabin dema qanûnên wek dogma ku ne bin bersiva êş û derdên civatê yên rojane, rayedar erkê xwe, serweriya xwe dewsa qanûnan bikartînin. Dîsa burokratên ku nikarin qanunan bikarbînin, arîşeyan bi riya bertîl, îltîmas û berjewemendiyên takekesî çareser dikin. Ev jî riya alozî, bêpergalî vedike, aştî û aramiya civatê dixe xetereyê.

Li Rojhilata Navîn; Tirkiye, Îran, Sûrîye, S. Erebîstin û gelek welatên herêmê xwedî qanûnên dubendî ne. Bendek qanûnên pîroz lê bûne dogma û nayên bikaranîn, bendek jî bi riya biryarên siyasî, tevna burokrasî û bi û xizmetkirina berjewendiyan e. Ev şêwaz zedeyiyê dide çand, kultur, jiyana gel, alozî, nexweşî û nebaşiyên civakê zêde dike. Di rûyê aloziya dubenditiyê de, aştî û aramiya civakê, rewşa aborî, gelêrî û siyasî jî dikeve nav xetereyê.

Jixwe carîna, ji ber hin sedeman hin bûyer diqewimin, hin kes îtîrafkariyê dikin, an jî hin kes û hêz dest dihavêjin rewşa heyî û bi mebesta pêşî lêgirtinê çalakiyan li dar dixin. Wê çaxê bêkêriya qanûnên heyî eşkere dibe. Li hember serdestan, sîyasetmederan, kesên serwer, burokrat û hin kesan bêçaretiya qanûnan xuya dibe.

Berevajî vê welatên pêşketî, an jî berjewendiyê gel esas dibînin, giringiyê didine qanûnan. Herkes mafê xwe, berpirsiyariyên xwe li gor erkê qanûnan destnîşan dike. Parastina xwe an jî doza xwe li gor çarçoveya qanûnan amade dike. Heke qanûn ne di cih de bin, an dadgeh bi xwe, an saziyên sivîl, an jî gel bi xwe tîne ziman. Hin caran bi xwepêşandan, serîhildan û protestoyan jî dengê xwe bilind dikin, rengê xwe nîşan didin.

Di nav van civatan de qanûn ne tabû ye û ne jî dogma ye. Pîroziyeke wê, taybetiyeke wê nîne. Berevajî wê rêgeza xizmetkariya gel e ku heyanî baş be, baş e û dimeşe. Lê çi wextî kewn be, li gor veguherîna civakê bê bersiv be êdî an ji binî ve radibe, an jî vediguhere li ser şert û mercên heyî.

Her wiha ji bo qanûnan dewlet jî ne pêwîst e. Ji gundan heyanî bajaran, ji zengînan heyanî hejaran hemû beşên civakê dikare bi hev re bicivin rê û rêbazên bi hev re bimeşînin ava bikin ku, ev lihevhatin bi taybetî devkî ne û li ser sozê bê minet dimeşe. Civakên wiha ji dewletan jî jîrtir in. Çand li ser hîmê pergalsazî, erf û edetan, soz û peyamên hevgirtî ku reng bidin şêwaza jiyanê diberide û xêrûbêra wê digihêje şêniyan.

# Pekîn xeleka li dora stûyê Tacîkistanê teng dike

NihaTacîkistan ji bo tevlêbûna Çînê di warê ewlehiyê de li Asyaya Navîn pêşengiyek çêdike. Li vir, bi ihtimaleke mezin pêşbaziyek tûj di navbera Çîn û Rûsyayê de dibe ku were destpêkirin, ku dikare ber bi encamên ne pêşbînîker ve bibe



Kurdistan Lezgiyeva

Her komara Asyaya Navîn nîşana sereke ya rola zêde ya Çînê ye. Rastî ev e ku li her yek ji van welatan, Pekîn amûrên cuda yên bandorê pratîze dike. Li deverek kredî, li cihek – bi elîtan re têkilî têne lîstin û îro jî "hêza nerm" a çînî ketiyeTacîkistana piçûk.

Welatê herî biçûk û xizan ê Asyaya Navîn, ku di şerê navxweyî yê bixwîn de di salên 90'î de xilas bû, xwedî girîngiyek stratejîk e. Di kûrahiyên wê de depoyên mezin ên zêr, keviran, metalên biha hene. Ji dabînkirina ewlehiya herêmê sînorê bi Afxanistanê re kontrola Pamir dike. Çîn ji boTacîkistanê ji berê de bûye yek ji mezintirîn şirîkên bazirganiyê, çavkaniyeke girîng a veberhênan û krediyan û her wiha îxracata herî mezin.

Ji bo dewletek piçûk û belengaz, mantiqî ye ku mirov bala xwe bide ser cîranek bihêz. Lê di têkiliyên Çînê yên bi Tacîkistanê re perspektîfên pir xeternak hene. Bi Pekînê re têkilî pêşve dibin, Duşanbe vektorên din ên siyaseta derve jî bi sînor dike.

**Têkiliyên bi Îranê re**

Mînak, hevkariya bi Îranê re. Berê, du welatên farisîaxêv pir nêzbûn, lê piştî qedexeya Partiya Ronesansa Îslamî ya Tacîkistanê (IRPT) ya dijber, danûstendina dualî pir sar bû. Heya sala 2013'an, IRPT wekî hêzeke siyasî ya qanûnî beşdarî hemû hilbijartinan bû, lê saziyên qanûnê tevlibûna partiyê bi hewldanên derbeyê tawanbar kir. Ji hingê ve, îranî li benda gavên nêzîkbûna ji Duşanbe ne sekinîne.

Welatên rojavayî jî welatekî Asyaya Navîn zêde eleqedar nake. Tenê Rûsya bi hevkariyê re eleqedar e (li vir pirsgirêka sinorê Afxanistanê û daxwazên entegrasyonê ye), lê li vir jî her tişt ne xweş e. Çend sal berê, dihat plankirin ku bi Tacîkistanê re Yekitiya Aborî ya Avrasyayê (EAEU) pêk bê, lê ew qet çênebû. Duşanbe vê yekê li benda projeya entegrasyona Avrasyaya Moskowayê hişt. Pir gengaz e ku rêveberiya tacîkî di bin tesîra Pekînê de biryarek wisa daye.

Hevkariya bi welatên din ên Asyaya Navîn re jî baş naçe. Serokê Tacîkistanê Emomali Rahmon beşdarî her du lûtkeyên serokên komaran bû, lê ev nebû sedema encamdana tu peymanan an destpêkirina projeyên hevpar. Hevkariya bi cîhana ereb re ji sektora enerjiyê wêdetir naçe. Ji ber vê yekê derket holê ku, bi gelemperî, ji xêncî Pekînê ji welêt re tu heval tune ne.

Çîn amade ye ku krediyan, teknolojiya hinardeyê peyda bike û ya girîng, di warê leşkerî de hevkariyê bike. Tacîkistan yekem welat bû ku li herêmê beşdarî însîyatîfa ewlehiya Çînê bû. Mekanîzmaya çaralî Çîn, Pakistan, Afxanistan û Tacîkistan tîne ba hev. Ew ji sala 2016'an û vir ve kar dike û tê de hevsengî bi riya civînên asayî yên sekreterên civatên ewlehiya welêt heye. Riya Duşanbe ya ber bi Pekînê ve bi vê ve sînordar nabe. Tacîkistan bi rêk û pêk piştgirî dide helwesta Çînê di hemû dengdana NeteweyênYekbûyî de.

**Deynê derve yê Tacîkistanê**

Bê guman, ev vektora siyaseta derve ya siyaseta tacîkî ji ber têkiliyên biratîyên di navbera her du gelan de pêş neketiye. Duşanbe 1,2 mîlyar dolarî zêdetir deyndarê "birayê xwe yê mezin e", lê deynê derveyî yê Tacîkistanê bi tevahî 3,2 mîlyar dolar e. Kredîtorê herî mezin ê Tacîkistanê Bankaya îxracat-îthalatê ya Çînê ye ku xwediyê ji sedî 49 ê mal û milkê welêt e. Ji sedî 40 deynê derve yêTacîkistanê dikeve ser Çînê.

Tiştê herî balkêş ev e ku ew bi gelemperî qala mercên ku Tacîkistan krediyên çînî werdigire nakin, li ser deynên biyanî daneyên fermî hindik in. Çîn daneyên li ser krediyên hatine dayîn, rêjeyên faîzê û mercên wan aşkera nake. Lê Pekîn berjewendiyên xwe yên karsaziyê hene, û şertê sereke ji bo deynên tawanbarî beşdarbûna pargîdaniyên çînî di projeyên darayî de ye.

**Xurtkirina pêwendiyan**

Her sal ji boTacîkistanê dayîna deynan dijwartir dibe. Di destpêka 2021'ê de, rayedarên welêt bi daxwaznameyên ku ji bo diravdanên demê bidin, serî li saziyên darayî yên navneteweyî dan. Çîn bi kêfxweşî li ser vê yekê razî bû ku destûr dide heyanî 2021'ê dirav werin rawestandin. Lê derengmayînên bi vî rengî biha ne. Ji sedî 80 depoyên zêrên Tacîkistanê li ba Çînê ne. Ew wekî faîzê deyn têne veguhastin. Di heman demê de, Çîn diravdana dirav bi aboriya tacîkî dike ku tenê bêtir pêwendiyê xurt dike.

Di nav 14 salên borî de, deynê Duşanbe yê ji Pekînê re hema hema şeş qat zêde bû, bi saya vê para imparatoriya Ezmanî di gelek depo û karsaziyên herî ber bi çavên welêt de heye.

**Kêmasiya enerjiyên zivistanê**

Niha li Tacîkistanê zêdeyî 400 pargîdaniyên çînî kar dikin, ku wan dike bacgirên herî mezin. Di van çend salên borî de, pargîdaniya Çînî TBEA pênc xetên kerabeyê çêkirine, vê yekê gengaz kiriye ku perçeyên cihê yên pergala enerjiya welêt bi hev ve girêbide ku li ber gelek salên kêmasiya enerjiya zivistanê pir girîng bû. Wekî din, li Duşanbe, çîniyan santralek (CHP Dushanbe-2) çêkirin.

Helwesta Rûsyayê di vê mijarê de bi tevahî ne diyar e. Li gorî peymanên bêdeng ên der barê dabeşkirina warên bandorê de li herêma Asyaya Navîn, di destpêkê de "hêzên" Rûsya û Çînê li gorî prensîbeke zelal hatin dabeşkirin: Moskova -siyaset û ewlehî, Pekîn- aborî. Pirsek çêdibe: ma kiryarên Çînê yên li Tacîkistanê berovajî rêgezên lîstikê yên berê hatine pejirandin nabin?

NihaTacîkistan ji bo tevlêbûna Çînê di warê ewlehiyê de li Asyaya Navîn pêşengiyekê dike. Li vir, bi îhtimaleke mezin pêşbaziyek tûj di navbera Çîn û Rûsyayê de dikare were destpêkirin ku dikare ber bi encamên nepêşbînîker ve bibe. Ya ku li komarê diqewime dibe ku bibe modelek ji bo cîbicîkirina stratejiya nû ya Çînê li tevahiya herêmê ku heger xwe bispêre "hêzanerm".








Amed Tîgrîs

# Lênêrîn û qezenckirina zarokên tawanbar

Tawanbarî û krîmînalî pirsgirêkeke civakî ya navnetewî ye. Di her sîstemî de kesên tawankar, krîmînal hene. Tawanbarî di nav ciwanan de gelek zêde ye. Tu dewlet nikare ji sedî sed pêş li kesên tawanbar û bûyerên krîmînalî bigire. Ev bûyereke aloz û girîft e. Gelek sedemên wê yên civakî, çandî, aborî, malbatî û derûnî hene. Lê her sîstem an jî dewlet ji xwe re li rê û rêbazên kêmkirin û çareserkirina kes û karên tawanî û krîmînalî digere. Li gorî bawerî, çand, polîtîka û îdeolojiya xwe, qanûn û rêbazan dirust dikin û pêk tînin. Ez ê di vê mijarê de sê mînakên berbiçav bidim ka dewletên xwedî bawerî, îdeolojî, polîtîka û kulturên cuda çawa li vê mijara tawanbariyê dinêrin. Bi taybet ji bo zarokên tawanbar û krîmînal tedbîrên çawa digirin, ji bo perwerde, rehabîlîteya wan çi dikin, çend rêzan binivîsim.

Dewletên teokratîk, paşvemayî û oldar, zarokên ku li dijî qanûn û destûrên wan sûc bikin, cezayên herî giran, qebe û barbar didin wan. Wek mînak zarokekî ku li dijî rejîmê çalakiyekî bike, kevirekî bavêje leşker an polîs, zerarê bide malê kesekî, di karê diziyê de were girtin an sûceke giran bike; ji girtin, kuştin, bi dar ve kirin, îşkence, lêdanê dest pê dikin û dixwazin bi van metodên wehşî û tund zarokan bitirsînin, poşman bikin û bidin tobekirin. Heta li hin dewletên ku rêbazên îslamî hene, dest û piyên zarokên tawanbar jê dikin, laş û jiyana wan kut û seqet dikin. Bawer dikin ku bi van tedbîrên prîmîtîv (îptîdaî) pêş li krîmînalîtiyê bigirin, qaşo bi van tedbîrên xwe yên prîmîtîv civateke bi aram, rehm, pak, edeb û exlaq pêk bînin. Dewletên wekî Siudî û çendên din hîn îro jî bi rê û rêbazên şerîetê dixebitin, van şêweyên weha barbar bi kar tînin. Dest û tiliyên zarokan jê dikin, li qadan bi dar û keviran ricim dikin. Heft dikin heştê helandî, bi seqetbûnê jiyanê li wan dihedikînin. Probleman aloztir û mezintir dikin. Ji însanetiyê derdikevin û dibin cinawir.

Îran jî rê û rêbazên şerîatê bi cureyeke din carnan gulebaran dikin û dikujin. Carnan bi kevir û daran ricim dikin. Carnan jî ben û hefsar dikin serê wan li kuçe û kolanan digerînin, îşkenceyê bi wan dikin. Di nav civatê de kesên tawanbaran bêşeref û bêşexsiyet dikin, ji însanetiyê derdixin.

Li hinek welatên ku ji xwe re dibêjin "welatê demokrat," ew jî zarokên ku li dijî rejîma wan çalakiyekê bike, carnan bi awayekî eşkera li nav kolan û kuçeyan, li ber çavên her kesî dikujin. Carnan jî digirin, îşkence dikin û dikin girtîgehê. Bi salan di girtîgehan de dihêlin û heta destdirêjiyên wan dikin. Dema girtîgehê derdikevin jî li pêşberê wan bêkarî, birçîbûnî, bêmalî û belengazî hene. Rojên reş, tarî û bêhêvî li benda wan e. Di nav civakê de problem in. Bêtir krîmînaltir dibin. Girtîgeh û xirabî tim kar û mala wan e. Niha dewletên weha metodeke din jî dîtine, zarokên weha dikin paramîlîter, li welat û derî welat wan bi kar tînin. Ew ji artêşa xwe re dikin pêşeng û mertalê bigoşt. Îro Tirkiye bi xwe di vê kategoriyê de ye. Bi krîmînalên hemwelatî û yên biyanî li welatên wekî Sûriye, Iraq, Azerbeycan, Qibrîs, Lîbya, Yemenê ûhwd. bi lejyonî bi kar tînin.

Ewropî di vê mijarê de jî metodên zanistî û aqilane bi kar tînin. Zarokên krîmînal û tawanbar dibin navendên rehabîlîtasyonan. Li her şaredariyek teqez rehabîlîtasyonxaneyek heye. Li wan deran bi derûnînas, civaknas û pisporên perwerdeyê, ew rehabîlîte dikin. Program û projeyên perwerdeyî pêk tînin. Hewl didin ku rojeke zûtir ew vegerin mal û dibistana xwe, bi civakê re biguncin. Li dibistan, ciyê perwerdexane û li malê programên xwe didomînin. Giraniyê didin ser têkilî, kar û barên civakî, çandî û çalakiyên sporê. Her yek ji wan asîstaneke xwe heye. Di demên vala de hemû mesref li ser şaredariyan e û bi takekesî an bi grûbî ew dibin sînema, şano, festîval û geştên turîstîk. Bi grûbî dibin ger û geştên nav welat û welatên dereke. Li Stockholmê li du lîseyên cuda du şagirdên min ên weha jî hebûn. Wek mamosteyê zimanê dayikê ez jî heftê du saet li gel wan bûm. Ewropî bi van xebatên zanistî bi ser dikevin û zarokên sûcdar û krîmînal dibin zarokên normal û vedigerin nav civatê. Ji wan gelek kesên zîrek û dilovan derdikevin.

# Qetlîyamê Cansizan, Sêvêyan û Denîzan

Valêre

Rojêka bi qetilkerdişî cinîyêka kurd e de mi dest bi nuştene kerd. Werikna ma çîyanê kêfweşîyan û şadîyan binusnayêne la çi heyfo ke serebûtî kêm nêbenî û hewrê sîyayî pêşê mazluman nêverdenî. Wazenê welatê xo de bibe, wazenê zî sewbîna welatêk de bibe ferq nêkeno, wexto ke qala kurdan bibo qetlîyamanê hovaneyî pê yenî. Pêroyê dinya sond werda û kêfweşî kurdan rê qedexe kerda. Vera kurdan de hêzê hegemonîk bîyî yew. Kurdî zî şerê serdestan danî ramitene.

Hema gonîya Qetlîyamê Parîsî (9ê çeleyê 2013), qetlîyamê Silopî (4ê çeleyê 2016) nêbîbî zuha, qetlîyamê Îzmîrî pê ame. Cinîya ciwane Denîz Poyraze bînaya HDPyî ya Îzmîrî de serê areyîya xo de bi hîsanê hovaneyan hetê Onur Gence ra ameye qetilkerdene û fotografê ci hetê qatilî ra ame antene. No qetlîyam de zî dîyaro ke hedef qetlîyamêko girseyîbî. Kesêkî pê çeke senî bi asanî erzeno bîna ser û adir verdeno bîna? Gelo nê hêzî çara gêno?

Qetlîyam ra dima fotografê Gence ke verê cû pare kerdbî vejîyayî raşte. Xora fotografanê Gence ra asîyeno ke no kes kesêko perwerdekerde yo û semedê viraştişê qetlîyaman ameyo resnayene. Keso ke Sûrîye de safê çeteyan de şer bikero senî dest û linganê xo bi asanî têşaneno û gêreno? Hende qala demokrasî yeno kerdene la heq, huqûq, edalet û welat tena îdeolojîyêk rê xizmet kenê. Tîya de vatiş û kerdiş yewbînan nêtepişnenê. Her çî eksê vatişan de yo. Tacîz, tecawuz û qetlîyam çi beno wa bibo wexto ke semedê pawitişê welatî sucêk bêro kerdene o kes welatparêz o û cezaya tewr tay gêno.

Badê qetlîyamê Parîsî fekê selahîyetdaran ra zî vejîya ke Omer Guney hetê MÎTî ra ameyo wezîfedarkerdene û bi hawayêko şikin ame vatene ke zîndan de merdo. Yanî serê serebûtî ame padîyayene. Onur Gence zî qatilêko perwerdekerde yo. Engişta hêzan pêroyê serebûtanê sîyasîyan de esta. Nê hirê qetlîyamî zî sîyasî yê û zaf manenê yewbînan. Şexs cîya bibî zî kerdox yew o, amanc yew o. Şerê leymin de hedefo yewin şikitişê îradeya cinîyan o. Hêzê hegemonîk û serdestî hêzê cinîyan ra tersenê. Pêroyê qetlîyaman de hedef cinî ya.

Dinya dinyaya tay kesan a. Kurdan rê teng a, la hetgiran rê cennet a. Her kes zano ke peynîya zaliman qet çinî bî û çina zî. Hêzê tarî û çeteyê perwerdekerde reyna gûre sero de yî. Asayîşê kurdan ne tîya de û ne zî sewbîna welatêk de çin o. Ganî kurdî vera nê kerdişan de hêzê xo bikerê yew û destûr nêdê qatilî rehet têbigeyrê û helm bigîrê.




# Ceynika bêderde

Turabî Kişîn

Ceynikê cirê domanê nêbenê, rojê hêlê Heqî ra pê manena, diganê ya. Vana “Heqî çend serî yo domanê nêdê mi. Ez nê pirênê domanê xo berî ceynêyêde bêderde ci rê biderzo. Belkî Heq derdê nê dergûşê mi nêdo.” Bena hetê kamcî ceynêke pêro cirê derdê xo qesî kenê, nêdana ci.

Nêdana ci, ci ra vanê “Şo filan ceynêyê hanêka filan ca de, derdê aye çînê yo, a bêderda.”

A bêderd a... Na dana raye şona kewer kuna, ceynike kewer kena ya. Kewer kena ya ke ceynike binê lingan ra hetanê serê sarî pêro pîya ebe zernan xemelnawa. Na ver ra matê ci manena.

Ceynike vana “Bê zere ti qeyî nêna zere.”

Şona zere, ceynika kêyî vana “To xêra”

Na ceynike vana “Wilê mi xêra, ez ama cend serîyo mi rê domanê nêbîyêne, teze pê menda, mi vato ez nê pirênê berî hetê ceynika bêderde wa mi rê biderza ke belkî ez derdê cîgere meancî”

Ceynêka kêyî vana “Tamam wayê bê ronişe.”

Nişena ro. Ceynike nan dana ci awe dana ci. Bena jû odike de dana we. Vana “To na odikede xo wade, mêrdê mi şan de êno, wa to mevîno, mezano ti îtara. Bî şodir ke merdê mi şî ez pirênê to derzena.”

Ceynike a odike de vindena, qayt kena ke mêrde ame. Astorê binê rewano, astor reqesîno. Ceynike şona astorî gêna ancena zere. Mêrde virnêya aye êno zere, a kî dime êna.

Mêrde lal û kero. Ceynike awe ana lingan şuna, nan ana ver, nanê xo weno, lal û kero.

Lal û kero... Na vana belkîcî zonê nê mêrikî çînî yo, no lal û kero.

Maneno waxtê rakewtene, beno hermê ceynike ra, koşe de çîyê aznayê diwarî yo ey dêmdano hard. Ceynika bîne henê zen kena ke xalî aznayê diwarî yo, oxro ke henênîyo, mêrik paçê serî keno ya ke cinazo tedero.

Paçê serî keno ya dêmdano hard û ceynike cî dêmdano ver û kindirê xo gêno aye û ey pîya pêşeno. Şono oda xo de kuno ra.

Kuno ra... Na ceynika bîne ax kena wax kena “No derdo nêya bêbav çi yo? Ya Rebî no çi bî?”

Maneno şodir, şodir vazeno ra êno ê kindirî keno ya, rêna ê cinazî ê pacîdê pêşeno û beno koşê de tik keno.

Tik keno... Na ceynike vazena ra zê verî nanê deyî awa deyî ana ver. Mêrik weno, ayera dime waxtê şîyayîşê xo êno. Eke dano raye şono, na ceynike cî dima mêrikî dana raye şona. Na ceynika ma cî qubike de piro sêr kena. Qayt kena ke ceynike rêna şîye ci rê astor zerede zên û gem kerd ard. Ci rê pê dizgîn girot, mêrikî lîngê kerde ser ra şî.

Kerde ser ra şî... Ceynike êna zere, venga a ceynika bîne dana û vana “Wayê bê nan bore.”

Ceynike vana “Ez çi nan borî, emşo ez tewû nêhunijîya, hewn nêkewt çimanê mi. Emşo no çibî mi dî. No çiko çi tawawo, derdê xo mi rê vace ez xo rê şorî.”


Vana “Derdê mi owo ke, mêrdê mi seyîsêde xo bî, qaytê astorê mêrdê mi kerdêne. Seyîs sîya bî. Mi cî nêzanitênê ke mêrdê mi kîn dano girê. Mi tirî arde ma pîya werde. Tasa ke mi tirî kerdbî ci a tase rengê xo sipê bî. Rengê tirî cî sîya bî. Mi cî xeto kerde mi va ‘Hela qaytê tasa sipîye û tirîya sîyaye se jubinêra amê.’ ê cî va ke ‘Eya wule ez zana seyîsê min o sîya û to cî jûbinê ra ênê.’ Ez henê pa mat menda. Uştra şî. Oxro ke seyîs kişto. Derman kerdo ke boye medo. Aye ra dime pîşto ardo na oda. A roje ra hetanê na roje pe mi ro zulm keno.”

Ceynika bîne vana “Wî derd serê nê derdîra çînî yo. Hetanê nika to se tewat kerdo. To se vengê xo nêveto?”

Ceynike vana “Ez derdê xo kamîra vacî. Şar tewer ra qayt keno ez urtê zern û sêman de ra. Henê zen kenê ke ez bêderda. Ez veng bikerî cî kes pê mi înam nêkeno?”

Ceynika bîne urzena ra pirênê xo gêna vana “Mi fam kerd ke ceynika bêderde çînî ya. Ez xo rê urzî ra şorî kê xo”

Urzena ra xatir wazena û kuna raya kê xo û şona pirênê pitê xo a be xo derzena...





Dewey Ma

Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

## Areyî

Bi serran û zemanan verî merdimî şîyêne karwanî. Qeybî rayîr dûrîya, qeybî hendî leze biresê cayê xo gere serê sibayî rew bikewê rayîr, rew şorê. Ger înan ra yew erey bimendê cayo ke ê kom benê, henî şîne keye û vendayêne ci.

Helbet zey enkay bolixî çinêbî, werdê merdiman bi sînor bî. Serê sibayî çay wetêrî şarî germî dayêne ser û werdêne.

Serê sibayî rew go karwan wirzo we. Hawnenê dewijan ra yew nêameyo. Yewî şirawenê dima, vanê “Te ra vaje wa leze bêro.”

Ew şino, reseno verê keyeyî û vendeno

- “Karwan hadreyo, her kes ameyo, ma hîvey to yê.”

- “Temam, ti şo, ez ha yena”.

Heno bîn wext derbas beno la o nîno. Reyna yewî/joy şirawenê dima, eynî çî beno. Dima ra yewê bînî zî... Wexto ke ê peyîn vendeno, mêrik keye ra qîreno:

- “Vinderê ez germîya xo borî, wey... Ez ha yena.”

***

Bi seran dima ra, bajarekê tirkan de, Îzmîr de, kurdêke bi nameyê Denîz Poyraze serê areyî xo de hamî kiştiş. Poyraze HDP’yî bî. Bînaya HDP’yî ya Îzmîrî de bî û çende firingî, çende zeytûn û parçeyêke nan dabî verê xo. Gere areyî xo bikerdêne. Kezebsîyayan nêverda a areyîya xo bikera.

Helbet ti têkilî meseleya jor û ene meselaya ma yewbînan reyde çinî ya. La mesela ene wa ke na dinya de kurdan xo ra qet xêr nêvîna. Kurdî her eceqîyayî, her ameyî girewtiş, raştê îşkenceyan ameyî, ameyî vinîkerdiş, amey kiştiş... Nêverdayî kurdî saetêke bi aramî derbas bikerê... Nêverdayî kurdî tasêke awe rehet bişimnî, parçeyêk nan rehet borê. Nêverdayî kurdî areyî xo zî bikerê.


Û enka ra pey rewşa kurdan tewf zehmet a. Semedo ke nêwazenê kurdî bibê çîke, kurdî bibê wayîrê heq û huqûqê xo, nêwazenê kurdî bibê quwet.

La kurdî go ewro ra pey sekerê? Go stratejîya înan çi bibo? Go senî cuya xo dewam bikerê, go senî xo bipawî? Go silaman bidê kamî û silaman kamî ra bibirnê?

Enî persî û zehf persê bînî vernî ma de yê. Zemano vernî ma go bersivanê persan bimojno ro ma heminan. Wa bi xêr bo...

***


Erê Denîz Poyraze, erê delalîya dadê xo, kenaya babê xo... Xemgînî mi feyde nêdana la bizane ke ez xemgîn a...






## Tu mêrî biçe Qersê

Mirovek ji gundekî Farqînê diçe leşkeriya xwe li Qersê dike. Piştî çend mehan ji bo îznê vedigere Farqînê. Li leşkeriyê eziyeteke mezin dîtiye û wekî dibêjin ew fors û payebûna wî ya ciwantiyê tev têk birine. Her dem bi heqaretên mezin re rû bi rû maye. Bê guman gelekî bêriya mal û gundê xwe jî kiriye. Dema ji Farqînê ber bi gundê xwe ve diçe û nêzî gund dibe, kerek li ser bênderên gund dizire û fire fir ji devê wî tê. Dengvedana zirîna wî li wan car û bilindahiyan alan dide. Ciwanê farqînî di bin simbêlan de dikene û berê xwe dide kerê û wiha jê re dibêje: Tu mêrî û ewqasî jêhatîyî biçe Qersê vî hikmî bike.



## Tiştanok (mamik)



**1-**Tiştek min heye
Dara tuyê dikolin
dengan dikne navê
guhê wê ba didin

**2-**Tiştek min heye
Darika sûlavê
Pênc çiqil diçine wê navê
Sê sihê
Dido tavê

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine . Bi hêvî ne ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**
1- Tembûr 2- Nîmêj

## Zûgotinok

Îro me dîsa çend zûgotinok ji we re peyda kirin. De werin em pirsa xwe bikin, Kî dikare 3 caran li ser hev bêje?




**Ez çûme pirêzê**
**Min şeş qaz kuştin ji rêzê**
**Gotin min : kurê şeşqazkujê.**

**Heft di ser re**
**Heft di ber re**
**Û heft jî ji xwer û mere**
**Hê nû here milek giya bîne ji kera xwe re**

→ Lê ku ew jî nebû bêguman tuyê bikaribî vê bêjî. De ka 3 caran bêje:

**Heft qirên qut çûn kunekê**

## XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3. Raz 5. Sewaleke ku ji bo goşt û hiriyê tê xwedîkirin
7. Xemla ku jin dixin stûyê xwe 8. Pêşdaçekek 9. Kilam, dîlok
13. Îca, ji niha şûn de 14. Cebhe, bere 16. Bajarekî bakurê Kurdistanê
19. Xweşik, lihevhatî 20. Cejin 21. Vexwarineke ku ji mast çêdibe
22. Heywanekî bejî, şahinşahê daristanê 25. Agir
26. Evîndara Derwêşê Evdî 28. Ordî, koma leşkeran

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Bajareke başûrê Kurdistanê
2. Lewre
3. Noteke mûzîkê
4. Cihê mêwên tirî
6. Alava ku pê destlimêj tê kirin
10. Sewaleke bê zirar hem di avê de hem li bejahiyê dijî
11. Cihê ku çem tê de diherike
12. Alaveke ku berê rûnê xwe tê de hiltanîn
15. Serhişkî
17. Erê
18. Gundikê biçûk
20. Sala em tê de
23. Rengek
24. ji niha şûn de
27. Xwarina sewalan

Bersiva hefteya borî



# Perdeya Nostaljîk û Melankolîk



Sozdar Koçer

Bi baldarî li vê dîmenê li jorê, li ser perdeyekê xuya dike binêrin; Ev perdeya ku li ser wan nexşegulên nîsanê bi rengê qahweyî, şaxên ku xwe li dora gulan alandine û xwe bi berfirehî li ser wî perçeyî belav kirine. Qurma wan gulan di selikekê de ku mîna qefesê xuya dike ye û pê ve rişikên weke gezîkan xuya dikin daleqandî ne.

Dema tu li vê perdeyê dinêrî, gelo çi hest û biranîn tên bîra te?

Dema tu lê dinêrî teqez rûgeşiyek li ruyê te belav dibe, levên te li ser hev bi kenekî tenik weke şewqa hîvê vedike. Bîra te dest pê kiriye her kêliyên ku te bi zanîn û ne bi zanîn pê ve girêdayî hema derdixe der. Dil û hinavê te germahiyekê li giyanê te belav dike. Teqez gotinên tu yê bibêjî jî wê ev bin: 'perdeya zaroktiya min','Rûyê nivînên me!', 'Ew perde di mala me de jî daleqandî bûn!'....

Belê hema wisa ez jî tevgeriyam dema min di sepeta dayika xwe de ev perde dît.

Dilê min germ bû, min dikir ku bifirim! Wisa li min hat ku hevaleke min çêbû, ya ku şahidê zarokatiya min e! Şahidê tarî û ronahiyê ye. Şahidê tirsa ji tarîtiyê û şahidê xeyidandin û şermokiyê ye. Şahidê bêdengiya bîranînên me yên kûr e.

Baş tê bîra min, dema em ji dê û bavê xwe dixeyidîn, me xwe li pişt vê perdeyê vedişart û lingên me yên pêxas xuya dikirin. Me dixwest em werin dîtin, lê rûyê me neyê xuyakirin! Dema me şerm bikira yan jî netebitîbûna me xwe li perdeyê dialand û qunçikê perdeyê dixist nav diranên kêlekê û bi çavên şermoke dinihêrî û li benda hilmvedana bexşandinê bûn. Ev û gelek bîranînên dîtir bi dîtina vê perdeyê di hişê min de ji nû ve vedijin.

Ez ji xwe dipirsim gelo çima heta roja me îro ev perde di sepetê de ye?

Dibe ku dema dayika min ev perde dîtibe wê jî heman hest û bîranîn pê ve girê dabe weke min?

Dayika min cara yekem di sala 1987'an de van perdeyan ji bo mala xwe dikire. Li gorî gotina wê perdeyên li sûk û bajêr tev ji van bûne, bi tenê reng û gul eynî nebûne lê wekî din gişt heman nexş bûne. Di wan salên ji 1960'an heta dawiya 1990'î de hema bêje li ber paceya her malê ev perde hebûne.

Di dawiya 1990'î de malbat neçar dimîne ji welêt derkeve û li Almanyayê bi cih dibe. Li dîasporayê penaberên ku beriya me hatine cil û pêwîstî kom dikirin û li penaberên ku nû hatine belav dikirin. Kîsekî şîn, tije cilên zarokan jî dibe para dayika min. Di nav wan cilan de, dayika min vê perdeyê dibîne. Li gorî ku dayika min behs dike, kêfxweşiya herî mezin bi hatina Almanyayê re ev perde bûye. Ji wê salê ve dayika min ev perde heta roja me ya îro di sepeta xwe de parastiye.

Ew çi rewş e ku di sala 2021'ê de li min jî bandorê dike û beriya 21 salan weke li dayika min bandor kiriye?

Ev çi rewş e ku li efxenîyekî, kurdekî, erebekî heta kosoviyekî bandor dike? Bersiv ne perde ye. Bersiv bîranînên me ne, yên ku me bi perdeyê re hatine bîra me. Ji ber ku di wê demê de ew hevpariyên jiyana me bûn. Mirov dikare bibêje ku bîranîn û hestên her mirovî şexsî ne, lê ya ku wan bîranînên takekes îro derdixîne holê û jê bîranînên kolektîv pêk tên ew perde ye. Dibe li başûr bi perdeyê re rojên enfal û penaberiyê werin bîra hinek mirovan. Dibe li rojava rojên di xaniyekî kelpîç û jiyaneke aram were bîra hin kesan. Dibe li bakur kêliyek were bîra mirov, dema malbat li ber perdeyê kom dibûn û dîmenek dikişandin... Ev bîranîn tev dikarin bi wê perdeyê werin xeyalkirin.

Ev perde ji ku hatine belav kirin?

Van perdeyan ne bi tenê malên li bakur û Tirkiyeyê her wiha gelek malên li Rojhilata Navîn jî xemilandine. Ji başûr bigire heta bakur, rojava, rojhilat, li dewletên ereban, li Efxenistanê, Pakistanê û li kevîka Ewropayê li Kosovo jî di wan salan de ev perde wek alayekê li ber paceyên her kesî bûn.



Ev perde li her deverê belav bûbûn, lê te ji kê bipirsiya kesî nizanibû ev perde li ku hatine çêkirin. Bi texmînî digotin yan ji binxetê hatine yan jî ji Iraqê, lê tu agahî û çavkaniyeke zelal der barê perdeyan de tune ye.

Vegotina vê serpêhatiyê konsepta, 'bîra kolektîv' derdixîne holê ku di 1920'î de ji aliyê fîlozof û civaknasê fransî Maurice Halbwachs ve hatiye danasandin. Piştî wî ev binavkirina 'bîra kollektîv' ji aliyê zanyarekî Alman Jan Assmanî ve hatiye pêşxistin. Assmanî ev konsept weke 'bîra danûstendinê' û 'bîra çandê' dabeş kiriye. Li gorî Assmanî bîra danûstandinê ango tecrube û erf û adetên civakekê yên ku bi devkî hatine parastin û vegotin, dikarin heta 3 nifşan bên parastin. Ev bîr jî bi vegotinê ango bi danûstendinê ve girêdayî ye û bi qasî wê temenê danûstendinê dikare bijî. Dema vegotin biqede ew bîr jî hêdî hêdî bi dawî dibe. Assmanî wisa pênase dike ku bîra çandî jî danûstandinê xurt dike. Ev bîranîn jî behtirîn bîra muzîkê, ya wêjeyê, ya hunerê û ya avahîsaziyê ye.

Em dikarin çawa şiroveya, 'bîra kolektîv' bi mînaka xwe ya perdeyê re zelal bikin?

Em ji her welatî mirovekî/e ku bi wan perdeyan re mezin bûye bînin ba hev û vê perdeyê nîşanî wan bidin, gelo wê çi bibe? Teqez bîranîn wê bi xwezayî derkevin pêş û danûstendina bîranînan wê pêk bê. Ev danûstendin û mijûlbûn wê bîranînên şexsî û bîranînên hevpar bi zelalî derxînin meydanê û wê têbigihîjin ku bi saya, 'bîra kolektîv' ew hev temam û xurt dikin. Û wê tê bigihîjin ku bîranîna hinek tiştan ji bo armanc, sekin û nasnameya wan pêwîst e. Di vir de em dikarin bêjin ku sembola hevpar ev perde ye û bi vê perdeyê re jî bîranînên kolektîv derdikevin pêş.

Bîranîna kolektîv nayê wê wateyê ku dîmen, sembol, bîranîn û tecrube ji aliyê her kesî ve weke hev bên şîrovekirin û weke hev teşe bidinê. Na. Her şexsek bi awayê takekesî wan li gorî xwe şîrove dike û wate didê.

Bi vê teoriya heyî û bi piştgiriya mînaka perdeyê, mirov dikare di lêhûrbûnên xwe de kûrtir û berfirehtir rewşê vebêje. Ew jî ev rastî ye ku dayika min 21 salan li Almanyayê perde di sepeta xwe de parastibû. Li diasporayê malbatên me di bîranîn, vegotin û parastina sembolan de gelekî xwedî israr in û bêhtirîn her tiştê welatê xwe, hêstên li wê axê, li wê malê, li ber wê perdeyê li tiştên sembolîk bar dikin.

Bi derketina dîasporayê re mirov dikare bibêje ku her tiştê wan di wê sala derketinê de sekinî maye. Tu li malên kurdên dîasporayê binêrî, her sembolên ku li welat di malên wan de bûn îro jî di malên wan de ne. Wek merşikê nexşkirî bi rengên germ, sûs û tenteneyên dolaban, lûfikê seran, merşikê dîwaran, lempe - çira hwd.

Mirov dikare bibêje ku qutbûnek ji civak, ax, malbat û jiyana li welêt çêdibe û da ku malbatên me bikaribin li welatên biyaniyan berdewam bijîn, her kêlî û bîranînên xwe diparêzin ji ber ku ew nasname û koka wan e. Sembolên wisa ji wan re dibin alîkar da ku bîra wan her zindî bimîne, bîranîn, hêstên germ yên welêt, hestên bi bawerî û nas her li der dora wan bin. Malbatên me, divê paşeroj û pêşeroja xwe biparêzin da ku li xeribiyê li ser piyan bin! Ev jî dikare weke şêwazekî parastina bîra kolektîv were pênasekirin.

Îro em dikevin ferqa hêstên ku li sembolan hatine barkirin û êdî em jê diaxivin. Weke kurd divê em vê bîra kolektîv baş tê bigihîjin û biparêzin, ji ber ku em bi sedsalan e bi êrîş û tunekirinê re rû bi rû ne. Divê em ji bîr nekin ya ku em anînê vê astê bîra me ya kolektîv e.

Lewra divê em bi hişyarî dest pê bikin ji bîranînên xwe biaxivin û jê sûd werbigirin, em wan binivîsînin û wisa jî biparêzin. Parvekirin û axaftina bîranînan wê me li jiyanê bietirîne, girê bide! Lew re divê em dest pê bikin wan perdeyan li paceyên xwe daleqînin, wan lûfikan, çarikan, pepikan û ruyên nexşkirî ji sepeta xwe derxînin û bikin parçeyek ji rastiya xwe! Ji ber ku ew rastiyên me ne! Bîranînên ku me gelek tiştên din li wan bar kirine rastî û çîrokên me ne! Em encamên tecrube û biranînên xwe ne. Divê em êdî bi bîra xwe ya kollektîv hev temam bikin û çandeke bîranînan ava bikin. Divê em dest pê bikin valahiya dîroka xwe bi xwe dagirin û bi xwe binivîsînin!

# Ji bo zarokan filmên karton

Însiyatîfa bi navê Malbenda Çandê ya Helebê li taxa Şêxmeqsûd rêzeçalakiyek ji bo pêşxistina zarokan li dar xist. Însiyatîfa ku bi armanca zarok hînî fikrên baş bibin, bi pêşandana fîlmên karton ên bi zimanê kurdî bi naverokên balkêş hatin parvekirin.



Malbenda Çandê bi fîlmê karton ê bi navê Pînokyo fîlm weşandin. Tê zanîn ku Pînokyo lîstokeke textî ye. Gelek zarokan jî kêfxweşiya xwe bi vî fîlmê karton anî.

Hevseroka Malbenda Çandê ya Helebê Leyla Xalid destnîşan kir ku armanca sereke ji vê însiyatîfê dagirtina valahiya li gel zarokan di havînê de bi tiştên erênî ye û wiha got: "Gelek pêşniyar ji me re hatin, lê me perwerdeya zarokan bi rêbazên baş bi rêya fîlmên kartonî hilbijart."

Leyla Xalid da zanîn ku malbat û zarokan ev fikir bi awayekî baş pêşwazî kirin û dê her roja pêncşemê fîlm werin pêşandan.

Leyla Xalid di dawiyê de got ew hewl didin dewreyên wênexêziyê û dewreyên zimanê îngilîzî vekin, da ku zarokên di krîza Sûriyê de hatine dinê, sûd wergirin. ***HELEB***




# Ji Helîm Yûsiv berhemeke nû

Nivîskar Helîm Yûsiv bi navê Gava Masî Tî Dibin, Mêrê Avis, Sobarto, Firîna Bi Baskên Şikestî, 99 Morîkên Belavbûyî, Jinên Qatên Bilind, Wehşê Di Hundirê Min De û gelek pirtûkên din derxistine.

Yûsiv herî dawiyê bi navê 'Mêrê Ku Li Teriya xwe Digere' pirtûkek nivîsî. Pirtûka ku ji Weşanxaneya Peywendê çap bû dê dimeke nêz de derkeve. ***WAN***

xwebûn

21-27 Hezîran 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 79

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* Elif Can Alkan
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85


# Halay an govenda kurdan ?

Bate Romî

Di sala 1992'an de li Stenbolê, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê tê vekirin. Di merasîma vekirinê de kesên ji aliyê kurdan ve baş tên naskirin hene.

Musa Anter, Ismaîl Beşîkçî, Ebdurehman Dure û hwd. Li wir, Ebdurehman Dure wisa dibêje: "Ew govenda me teva ye! Hûn tev hatinê vê govendê ser çav û ser serê me re hatine! Ez ê ji we re şiîrekî min nivîsiyê di heqê vê govendê me de bixwînim, guhê xwe bidinê!" Di dîmenên wê rojê de dilgeşî û kelecaniyê kesên ku beşdariyê vekirina Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bûnê zêde zêde tê heskirin.

Ne tenê li wê derê, di hemû bûyerên diqewime de an jî belasebeb(?) pir caran hestek tê dilê kurdan û radibin govendê digirin. Gelek aşkera ye ku govend di jiyana kurdan de cihekî fireh digire.

### Fikra netewbûnê

Li piştî belavbûna fikrê nasyonalîzmê; hemû dewletên derketine holê fikrê nasyonalîzma xwe li ser hinek hêmanan ava kirine; wek ziman, çand, folklor, dîrok û her wekî din (hwd). Wek endamê çand, dans jî bûye yek ji wan hêmanan. Mirov dikare bibêje li bakurê Kurdistanê ku ji sedsalî zêdetir di bin bandora fikra netewebûnê tirkî de ye, guhertina dansa kurdî ya bi navê govend di du alî de diherike; di aliyê kurdan de û di aliyê tirkan de.

Di aliyê kurdan de; divê rewşa govendê bi sê awayî bê rexnekirin:

### Govendên berê û eslî

A yekemîn; mirov dikare wisa tarîf bike; çiqas li sînorê bakurê Kurdistanê ji navenda Tirkiye dûrtir be, govend jî ew qas dişibe zemanên berê û eslî. Hê jî kurd wekê berê şahiya xwe çêdikin û wek berê govend digirin. Gora herêman hin caran bi dahol û zirne, hin caran bi erbaneyan, rebaban govendê çerx dikin. Hin caran amûr disekinin tenê bi deng û stranan govend tên girtin. Yekî stran û govendan baş dizane deng digire û belav dike.

Ew ne para her kesî ye ku herê têkeve pêşiya govendê an jî kilaman bigerîne. Hin govend hene ku tenê kal û pîr digerinîn, hin caran tenê jin. Hin caran jî xort serê govendê digirin. Lê belê ew ên ku jê re xort tên gotin ne kesên panzdeh-bîst salî ne, divê dora sîh salî bibin. Wextê ku yekî mezintir tê dikeve serê govendê, yên xort bi rêzdarî cih didin wê/wî. Mîrov dikare bêje ew forma herikîna govendê yê herî eslî ye.

### Bandora amûrên elektrikî

A duyemîn; di piraniya wan herêman û herêmên din ê bakurê Kurdistanê de awayê govendê gelek guheriye. Dibe bê gotin ku qeydeya lîstikan hema hema ji sedî bîst-sih bileztir tê lêxistin. Amûrên tên lêxistin jî guherîne. Cihê dahol û zirne, baterî û elektro-baxlama girtiye û hinek amûrên wek org lê zêde bûne. bi saya amûrên elektrikî, dengê muzîkê bilind derdikeve û êdî tu kes bi stran û kilaman govendê nagerîne. Melodî û qeydên strana ku pê govend tê girtin jî guheriyê û şibiyê hin curêyên muzîkên din, wek pop, tekno û hwd. Wek guhertina qeydeyan, qelafeta govendan jî guhertiye. Bi bandora muzîka populer û dansan, lîstik jî êdî bi awayekî wekî break dans, dansa hîp-hop, dansa ferdî tê lîstin. Ew qas e ku hin caran mirov dibîne ku hin xort li qada govendê qilozan/teqle(?) diavêjin. Ne pir berê, sih-çil sal berê kesekî reftareke wisa bikira, ê bibûya qeşmerê wî heremî û carek din nikaribû derkeve qada govendê. Cihgirtina govendê jî gelek guheriye. Kesên kal û pîr edî hema hema qet govend nagirin û tenê temaşe dikin. Pir caran xortên panzdeh-bîst salî serê govendê digirin û heta dawiyê şahiyê bernadin. Ji bo kurdên ku koç kirine rojavayê Tirkiyeyê rewş hinek kêm hinek zêde eynî ye. Tenê cudatiyek derketiye hole, ew jî kurdên li wir ji kurdên li Kurdistanê zêdetir ji kolanan bar kirine xeyatan. Di navbera kurdên ku koçî dewletên rojava kirine de jî rewş di derekî navbera du awayên ku li jor hatiye tarîfkirin de ye. Li wir jî bandora kultura popûler ketiye nav şahiyên kurdan û govendê, lê hê jî fîgûrên marjînal wek qiloz/teqle avêtin zêde neketiye nav govendan.

### Govend ketiye destê saziyên dewletê

A sêyemîn; di aliyê sazûmanbûnê de, govend hê jî negihîştiye asta sazûmanbûnê. Li Tirkiyeyê govend hema hema bi temamî ketiye destê saziyên dewleta tirk. Li wan saziyan, govend wek standardên ji aliyê wan saziyan hatiye ravekirin tê hînkirin û lîstin. Kurdên ku li ser govendê dixebitin jî bi rêya wan saziyan dixebitin. Wekî din, hinek komele jî perwerdeya govendê didin, lê ew jî zêdetir dişibin "folklor kulubu"ya dewleta tirk û piraniya wan herêmî mane. Li dewletên rojavayî, her çiqas têde hêmanên çanda kurdan zêdetir bibe jî, dibe ku bandora ji Tirkiyeyê hatibûn an jî parçeya tevgera siyasî ya bakur bûn sebeb ku ew jî pir xurt nebûne. Di salên dawî de hinek kes û saziyên taybet dest bi fêrkirina "govenda kurdî" kirine, lê belê ew hê pir nû ne û hê jî qadeke pir mezin nagirin.

Di aliyê tirkan de; bi taybetî ji niviya yekemîn a sedsala bîstan, dewleta tirk hewl daye ku dansa kurdan bike hêmanekî fikra neteweya tirk. Lîstikên kurdan bi hin dansên neteweyên din wek "Bar"(Barlarımız)a ermeniyan , "Khoros"(Horonlarımız)a ruman; çerkezan û hinek jî bi dansên tirkan hatiye berhevdan. Ji temamiya wan re navê "Turk Halk Oyunlari", ji govenda kurdan re jî navê "halay" danîne. Lîstik li gorî bajaran tasnîf kirine; û bi rêya navendên perwerdeya gel (Halk Egitim Merkezleri), beşên folkloran li zanîngehan û federasyonan lîstikên gelan bi cih kirine, hewl dane ku wan lîstikan li gorî sazûmanî û çandeke hevpar saz bikin.


Her çi qas dewleta tirk hewl daye ku govendê bike çandeke hevpar jî mirov dikare bêje civata tirk di aliyê bişaftina (?) govendê de du reaksiyon daye.

Di aliyekê de, kesên ku zêdetir Tirkiyeyê wek dewleteke Rojhilata Navîn ku li ser çanda tirkan û Anatolyayê ava bûye dihesibînin govendê wek parçeya çanda xwe rave dikin. Wisa ye ku di hin parçeyên Tirkiye de tê dîtin ku hinek civata tirkan di şahiyên xwe de govend jî digirin. Li wir, bandora kurdan ku di demên cuda de koçkirina welatên din a Tirkiyeyê zêde ye.

### Pêşverûtî û dansa hiriman

Di aliyekî din de tirkên ku Tirkiyeyê wek dewleta ku divê bibe parçeya rojava dibînin û zedêtir xwe pêşverû dihesibînin jî pir guh nadin govendê û govendê wek dansekê nahesibînin. Dansên latînî, waltz, dansa yewnanan (sirtakî), balfolk, dansa modern û hwd. wek dans dihesibînin, lê govendê wek çandeke berbajaran û hiriman dibînin. Bi gelemperî, ew kesên ku xwe kemalîst û pêşverû tarîf dikin vê yekê dikin. Di demên dawî de, di aliyê kurdan de jî hin kesên ku di nav pergala kemalîzmê de mezin bûne û xwe pêşverû dihesibînin govendê wek dansa hiriman dibînin û rexne dikin, biçûk dibînin.

Dans ji serdemên kevnar vir ve her dem guheriye. Ê her tim jî biguhere, ew rasteqîniyek e. Lê belê, taybetiya folklorê ew e ku ji dema berê tê. Wek hêmana çandî, govend jî ji bo kurdan wisa ye. Wextê ku li derekê govend bê girtin, divê wek eslê xwe bê girtin. Ji bilî vê, edî ew nabe govend, ê bibe dansekî din û ê forma xwe ya eslî wenda bike. Wek zimanê kurdî. Çawa ku zimanê kurdî roj bi roj taybetmendiyên xwe wenda dike û dihele, dansa kurdan jî ê wisa bihele û ji holê rabe. Ji ber wê, divê kurd van hêmanên çandî bi xwe bigihînin asteke sazûmanî û bikin parçeyekî nasnameya kurd.




**Dîmen 1: Ebdurrehman Dure di vekirina Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de bi kelecanî radigihîne.**



**Dîmen 2: Sal 1905 Zarokên kurdan li Erîvanê ne, govend digirin.**




**Dîmen 3: Sala 1910'î Kurd li rojhilatê Kurdistanê govend digirin.**



**Dîmen 4: Xortekî kurd di dawetekê de derketiye pêş û qilozan/teqle diavêje.**



**Dîmen 5: Saziyeke tirk destpêkirina demsala nû ya kursê "halk oyunlari" dike.**

# Onogawa bi kaxezan qulingên piçûk çêdike

Hunermendê Japonî Naokî Onogawa ji zarokatiya xwe ve bala wî çûye ser hunerê orîgamî û ew heyranê vî hunerî ye.

Naoki Onogawa ji xeynî destê xwe, tiştekî din naşixulîne û bi serên tiliyên xwe bi hezaran qulingên piçûk yên ji kaxêzan çêdike. Ew van qulingên piçûk yên ji kaxezê li ser guliyên daran yên ku wek peykeran xuya dikin, bi cih dike û bi vî awayî berhemên serketî yên orîgamiyê derdixe holê.

### Çîroka destpêkirinê

Onogawa, piştî erdheja li Japonyayê ya sala 2011'an, dibe şahidê bûyerekê û ev bûyer bandoreke mayînde li hunera wî dike. Dema di nav dibistaneke hilweşiyayî de komek qulingên ji kaxezê dibîne, ew pir hestiyar dibe û li hember bedewiya wan matmayî dimîne. Piştî wê kêliyê, ew bêhtir bala xwe dide qulingên kaxezî û ew dibin mijara sereke ya berhemên wî. Wî heta niha bi serên tiliyên xwe bi hezaran qulingên ji kaxezê çêkirine û hîna jî ev kar dewam dike.

### Raboriya wan

Onogawa der barê qulingên kaxezî de dibêje, "Ez dixwazim cihekî ji qulingên kaxezî re vekim û wan dîsa bînim bîra mirovan. Ez dixwazim raboriya wan bi şêwaza xwe ya nû careke din vekişînim vê demê. Kesên ku qulingên ji kaxezê yên orîgamî dinasin di heman demê de li raboriya xwe jî xwedî derdikevin. Her mirov li gorî xwe li qulingên kaxezî dihizire û bi awayekî cuda wan hîs dike. Ez jî dixwazim bi van berhemên xwe yên orîgamiyê dilê mirovan ji nû ve geş bikim û bikim ku ew hin tiştan hîs bikin." *AMED*

